



Berpîrsê MED-TV'yê İlhan Kızıllan:

Televîzyona me wekî standarta televîzyona BBC, MBC û hwd. weşanên xwe dike. Ew gelê kurd û yê Rojhilata Navîn agahdar dike. Cara yekem e ku televîzyoneke wisa pîr-reng, hem ji aliyê ziman û hem ji aliyê çandê ve weşanê dike.

9Rûpel 8-9

# Wê dengê me

# ji her demê bilintir be!

NAVEROK



6

Î. Cûlemergî: Rengê rêveberiya tirkan



10

Salihê Kevribirî: Li gorî biyanan karektera kurdan



12

Çiya Mazî: Çend nimûne ji dûrikên li dawetan

Ji Xwendevanan

*Pêşt em silavên şoreşgerî li we dikin û serkeftinê ji we re dixwazin. Em Azadiya Welat her hefte bi kêf û eşq dixwinin û em jê fêde dibînin.*

*Lê em dixwazin ku hûn hinekî din nûçeyan berfireh binivîsinin û cih bidin ferhengokê. Bi nemaze hûn peyvên konevanî di ferhengokê de binivîsinin wê çêtir xwendevan jê fêde bibînin.*

*Vê heftê me xaçepirsa we tijî kir û peyva veşarî dît. Îcar ji bo ku em jî bikevin peşka xelatê em vê peyva veşarî ji we re dişînin. Careke din em ji we xebatkarên Azadiya Welat re serkeftin û azadiyê dixwazin. Di nivîsê de kemasiyên me hebin biborin em bi xêra Azadiya Welat hêdî hêdî zimanê xwe jî dielimîn.*

AYTAÇ ÖZTEMEL

*Bi rastî ji bo hînbûna zimanê kurdî rojnameya Azadiya Welat cihêkî girîng digire û risteke mezin dilîze. Lê bi tenê giraniyê nade vê mijarê divê ku hinekî li ser biyêrên ku li welat dibin, binivîsin. Em hêvî dikin ku Azadiya Welat van pêşniyazên me li ber çavan bigire.*

*Bi rastî jî em pir dixwazin zimanê xwe yê neteweyî bi xweşî hîn bibin. Lê mixabin ne pirtûkên gramera kurdî li ba me hene û ne jî pirtûkên bi zimanê kurdî li gorî ku tê xwestin hene. Ji ber vê yekê em hêvîdar in ku hûn ji me re pirtûkîna bi rê bikin.*

*Emê pir spasdar bibin, heke hûn vê daxwaza me bi cih binin.*

MEHMET SANCAK/BARTIN



Dîsa MED-TV

MEHMET GEMSİZ

**G**elê me di gîtên pir dijwar de derbas dibe. Her wiha heta niha di ser gelek astengan de jî qevaz daye. Ev qonax berdewam e.

Têkoşîna zarokên welatê rojê ne bi dewletekê an bi çar dewletan re; bi pergala dinyayê re ye. Pergala ku ew kiriye dîl û bindest. Ji lew re bergeha têkoşîna vî gelê ku dirûsmeya "ji serxwebûn û azadiyê birûmetir tiştêk nîn e" diavêje, pir fireh e.

Çawa ku bergeh fireh e, wisa jî têkoşîn piralî ye.

Kurdan di dîroka xwe ya têkoşînê de gaweke girîng avêtin û televîzyoneke navneteweyî ava kirin; televîzyona gelê bêdewlet MED-TV pêşkêşî mirovahiyê kirin. Ne-mirov jê zivêr bûn. Ji ber ku rûyê wan eşkere dibû û sînoren çêkirî dihatin hilweşandin. Bi taybetî jî di ser û mîjîyan de. Hişê birîndar êdî baş dibûn û bîr dibirin rewşa xwe.

Qeyd û lele parçe wesle dibûn. Pergala kedxwaran tûşî zinar û latan dibû. Hej lê diket.

MED-TV hem gelekî ku ji bo rûmeta xwe rabûbû ser piyan xurt dikir û hem jî rastî, heqîqet nîşanî raya giştî ya cîhanê dida. Di warê medyayê de roniyek bû ku tarî diçirand. Tê zanîn ku şevşevok (perçûmet) ji roniyê hez nakin. Lewma, MED-TV'yê ew bêheddar kirin.

Şevşevokan pir li ber xwe dan ku ek-rana wê tarî bikî, roniyaya wê bitefinin. Çarkezar lê xebitî. Tev gihiyan hev û ew girtin.

Lê miradê wan di ber wan de ma. Tenê karibûn 45 rojan wê bêdeng bikin.

Îcar MED-TV'yê ji berê xurtir silav li temaşevanên xwe kir, hem jî di rojêke pir bi mane de. Belê di 15'ê gelawêjê de. Ruhê destpêkerên şoreşa zarokên agirî jî şad kir.

Tu bi xêr hatî MED-TV.

\*\*\*

Xwendevanên me yên hêja, me ji ber tengasiyên xwe yên aborî buhayê rojnameya xwe zêde kir; ji 50 hezar lîrayê tirk, me kir 75 hezar lîra.

Ji bo ku em buhayê rojnameya xwe zêde nekin, me pir li ber xwe da. Lê bi tenê, heta vê demê me tirûş kir.

Li Tirkiyeyê her tişt bi dowîzê ve girêdahî ye, bi taybetî jî bi mark û dolar ve. Her roj zam tê ser kareseyên (malzemenyên) rojnameyê, bi vê yekê re jî jiyan buha dibe.

Hûn jî dizanin ku tenê hatina me ji firotana rojnameyê tê.

Em zêde dîr neçin, hema em li rewşa çapemeniya tirk binihêrin, em dê bibînin ku ew çawa çerxa xwe bi ger dixê, debara xwe li ser çî dike. Hema em du-sê tiştan bibêjin; krediyên ji dewletê, promosyon û hinek jî îlan...

Hêjayî gotinê ye ku, çendî çapemenî wekî hêza çarçûmî a demokrasîyê jî bê pejirandin an nixandin, bi ya me rola çapemeniyê di bin zen û gumanê de ye. Ji ber ku bi her awayî ve bi hikûmet û îktîdarên ve-girêdahî ne.

Li vir qesta me ne ji çapemeniya dijber (muhalîf) e... Îcar rewşa me ji we re xuya û eşkere ye.

Hetawî MED-TV helhatewe

BEKIR BAHOZ

**H**emû bîneranê xoşewîstman baş lew rastiye agadar in ke be hoy hel û teqelakanî dewletî tirk û hawpeymanekaniyewe, wata ew welataney ke xoyan be parêzerî mafi mirov û pasewanî serbestî derbirîni bir û ra dazanin, MED-TV naçar bû bo mawey 45 roj pexşî bernamekanî xoy rabigrêt.

Belê Dewletî Turkiya û gewre hawpeymananî hebûnî televîzyonêk be zimanî kurdî bo gelêkî 35 milyonî û bêdewlet be rewşa nazanin. Dewletî Turkiya hewalî girtinî televîzyonî kurdî be serkewtinêkî gewre bo dîplomasiyeyî dewlet le qelem da û hewalekeşîyan le ser rûy yekemî rojnamekan û le kenale cor be corekanî televîzyonewe bilaw kirdewe, heman kat waşîyan nîşan da ke êdî ew dengyan xinkand û carêkî-tir MED-TV rûnakî nabîne.

Belam be pêçewaney hemû hewl gûşar û zordariyekewe û her wekû karmendanî televîzyonîş peymanîyan be bîneran da, ser le niwê MED-TV jiya-yewe û dilî hemûmanî şad kird.

Mawey ew 45 roje sercem karmendanî televîzyon wekû kûrey heng le kar da bûn, berêweberayeyî televîzyonîş dirêjey be hewl û xebatî dîplomasiyaney xoy deda bo ewey ser le niwê derwazeyekîtir bo pexşî bernamekan bidozête-we, le encam da dîplomasiyeyî kurd serkewtinêkî bêwêney be dest hêna û carêkî tirîş hetawî MED-TV le hemû parçekanî Kurdistan helhatewe, carêkî tirîş dengî zûlal û sîmay şîrînî kurdî be bi şepolî mange dest kirdekan da degat malî hemû kurdêk û le hemû parçekanî Kurdistanî xoşewîşt man. Helbete serkewtinî dîplomasiyeyî kurd ewe nîşan dedat ke kurd ne tenya meydanî xebatî giwêzawetewe bo gorepane nêw dew-

letiyakan û bes, belkû lew biware da serkewtinî gewreş be dest dênêt ke eme mûjdebexşî rojanî serkewtin û şadbûnî gelî kurd e be azadî û serfirazî.

Cêgay guman niye ke diway hezar saley dîr le yekî parçe parçeyîman MED-TV teniya damezrawêk e ke le yekman nizîk dekatewe û deng û basî hezar saley le yek dîrî û awareyman le rêy ewewe bo yek dî degêrînewe. Be hoy televîzyonekemanewe boman rûn debêtewe ke êmey kurd, êmey gewretîrîn netewey bêwelat, çend le karwanî rojgar diwa kewtûyn û be çî şeweyekî diridane le layen dewlete dagîrkerekanewe deçewşendîrînewe. MED-TV detwanêt rolêkî mezin bibîne le yekbûnî neteweyetîman da, boye pêwîst e hemûman xoman bwe xawenî bizanîn û temaşay bikeyn û bo pêşzistîni bernamekanî têtikoşîn û yarmatî bideyn.

**M**a pêro ko zami ki 30'ê adarê 1995 di MED-TV abya. Yanê no roj ra tepiya mîletê kurd jî bî wayirê televîzyonî. MED-TV televîzyonê mîletê kurd ê sifteyin o. O nê roj ra tepiya, bi vengê Kurdistanî. Hemû kes zano ki jew televîzyon bê reklaman nêgeno payd vindiro. La belê MED-TV qe reklam negirod an çî hemû televîzyonan ra rind weşan kerdê. Çimki mîletê kurd MED-TV ra wayir vejîyayê; vat: "No televîzyon heme ciyê mawo. Ma di wayirê vejîmî televîzyonî xo." MED-TV, hemû parçey Kurdistanê û hemû cayê dinyay ardê ma ver. Qandi coya

Ti xêr ameyê MED-TV

dewleta tirk va se kirî, se mekirî, nê televîzyonî racenî. Ez ki ney meracenî se, mîletê kurd aqil yena xo. La belê dewleta tirk nêzanayî mîletê kurd aqil yewa xo. Dewleta tirk soyin di MED-TV racana. I'ê tîrmeh di, MED-TV racanaya, o wext xeftiyayanê û temaşevanê o televîzyonî vat: "Bê MED-TV nêveno, ma di televîzyonî xo fina ronimi." Vêşî neravird, 45 rojî ravird MED-TV fina abya; him jî verî ra diha rind û diha weşî (zaf). Verî 6 seatî bi, weşanê ci, nika bi 8 seatî. Mîletê ma wextê ki MED-TV rajaniya

vat: "Ma dê se bikim, se nekim, ma dê MED-TV akim. Bê MED-TV nêbeno vat û ewro akard. Nowa tepiya mîletê kurd zey verî televîzyon di xo rê wayir vejîyo. Çim ki MED-TV heme ciyê mawo; MED-TV çimê mawo ki vînenno, goşê mawo ki eşneno û zîwanê mawo ki qisey kenê mawo. Qandê coya ma zîwan, çand, rojname û televîzyon di xo rê wayir vejîmî, ma ki wayir mevejîm se, zey Heskişê awk vin di maneno. Mayê nêwazîm se awk vin di bimano se, wayir vejîyim. Mayê fina vînan, ti xêr ameyê MED-TV.

MEMED DREWŞ



**Serokê Tevgera Demokrasiyê ya Nû (YDH) yê Giştî Hüse-  
yîn Ergûl li ser gera Serokwezîr Necmettin Erbakan civîneke  
çapemenî pêk anî. Ergûl, roja 13'yê gelawêjê li Stenbolê li  
ser mijara 'Zîrveya çaran' rawestiya.**

Li gorf Ergûl mebesta lidarxistina civîneke bi vî rengî per-  
çiqandina kurdan e. Serokê YDH'ê Ergûl got: "Erbakan de-  
ma ku diçû Îranê got ku Tîrkiye, Îran, Iraq û Suriye di nav  
xwe de wê zîrveyekê çêbikin û ji bo çareserkerina problema  
bakurê Iraqê; lê birêz Erbakan ji çareserkerina problema  
bakurê Iraqê, perçiqandina gelê kurd fêrî dîke."



**Serdozgerê Komarê yê navçeya Beyoğlu der heqê Dayikên  
Windabûyan (Dayikên Şemiyê) de doz vekir. Di îdianameya  
dozger de navê 680 kesî wekî bersûc cih girtîye. Kesên ku lê  
doz hatiye vekirin ne tenê malbatên windayîyan in. Di nav  
wan de endamên Komeleya Mafên Mirovan (IHD), huner-  
mend, rewşenbîr û aşîxwaz jî hene.**

Doz li gorf zagona lidarxistina xwepêşandan û meşan ha-  
tiye vekirin. Li gorf vî zagonê kesên ku bêdestûr meş û xwe-  
pêşandan li dar bixin, divê ji 3 mehan heta 3 salan ceza  
bistînin.

## NÛÇE

### DIK

## Êdî zarokan jî înfaz dikin

Ji Heskîfa Kercewsê hatibûn, ji  
welat dût ketibûn, ew bi hêvî  
bûn. Dev ji dozê bernedabûn;  
navê bêrîtî û dîlanê li zarokên xwe  
kiribûn.

Ömer Bayram bavê 3 zarokan bû,  
28 salî bû û di karê însaatan de  
dixebitî. Serê sibeha zû diçû kar û  
ber bi êvarê dihate mal. Yeter  
Kaplan kebanîya malê bû, ji welatê  
xwe û ji zarokên we gelek hez dikir.  
Bîrayê mezin Gökhan bi destê  
xwişkên xwe Bêrîvan û Dîlanê digirt,  
li pişt xaniyên xwe bi wan re dilîst.

8'ê Gelawêjê di berbanga sibê de  
dema Edene û Çukurova di xewnê de  
bûn, li Beldeya Küçükdikiliyê  
qiyamet rabûbû. Hêzên reş û tarî  
avêtibûn ser avahiya numre 10'an li  
kolana 68'an. Belê ew der mala mal-  
bata Rıdvan û Yeter Bayram bû.

Wê şeva tarî Gökhan, Dîlan û  
Bêrîvan cara dawî dengên dê û  
bavên xwe bi qêrîneke tûj bihistin.  
Dayika Yeter pêşî pêlekane xwe di  
pencereyê (şibake) de avêt da ku  
xwe xelas bike. Ew ji mirinê bi zor  
filitî. Pişt re jî bi hesret Dîlan û  
Bêrîvan hembêz kir. Lê guleyên  
belqîtî, canê di bedenên biçûk de sar  
kir. Dîlan û Bêrîvan tava wê rojê  
nedîtîna mîna bavê xwe û mêvanê ku  
li mala wan bû. Serê sibê ji mala  
bêsewax û bêboyax 5 cesedên sar,  
cemidî parçebûyî derxistin. Dido ji  
wan hêj sexelên ber destên dayika  
xwe bûn. Ji aliyê din jî bi navê Nuri  
Kocabıyık amîrekî polîsan hatibû  
kuştin.

Kesên ku bi panzêran avêtibûn ser  
malê digotin bombe teqîye, lê xuya  
bû ku tola amîrê xwe ji Dîlan û  
Bêrîvanê hilanibûn. Di mitbaxê de ne  
tûp û ne jî ampûl teqiyabû. Zarok di  
bin dezgeha mitbaxê de gulebaran  
kiribûn. Binê dezgehê mitbaxê ji  
xwînê sor bûbû. Zilamekî gundiye  
wan bi navê Rıdvan Altun jî, piştî  
bûyerê li hemberî xaniyê wan bi  
guleyekî kuştibûn û pişt re ew jî  
avêtibûn nav gola xwînê.

AZADIYA WELAT / EDENE

# Valakirin û şewitandina gundan berdewam e

**IHD'ya Stenbolê roja 7'ê  
gelawêjê daxuyaniyek da.  
Li gorf vî daxuyaniyê  
gundiyan Gajik û Harçatura  
Gêxiya Bîngolê serî li IHD'ê  
dane û diyar kirine ku gundên  
wan bi destê hêzên dewletê  
hatine şewitandin.  
Tê gotin ku kalekî 70 salî bi  
navê Şahin İlhan li  
Doğansaya Midyadê ji aliyê  
leşkeran ve hatiye  
ulebarankirin**

**D**i ser gotinên Serokwezîr  
Necmettin Erbakan ên tîk-  
ilî vegeandina koçberan  
re du meh derbas bûn. Lê  
rapor û daxuyaniyên li ser vî mijarê,  
êşkerekî dikin ku di vî warî de tu gav ne-  
hatine avêtin, berevajî van gotinan, va-  
lakirin û şewitandina gundan hê jî de-  
wam dîke.

### Di mehokê 30 gund hatin valakirin

Wekî mînak IHD'ya Amedê roja  
19'ê tîrmehê daxuyaniyek dabû, di vî  
daxuyaniyê de bi gelek mînanan tê nî-  
şandayin ku vegera gundan derew e, hê  
jî gund bi darê zorê tên valakirin. Li  
gorî daxuyaniyê ji destpêka meha pûş-  
perê heta 12'yê tîrmehê li deverên cur  
bi cur ên Kurdistanê zêdetirî 30 gund  
hatine valakirin û şewitandin.

Li aliyê din, heftiya çûyî Cigirê  
Sekreterê Giştî yê CHP Sinan Yerlikaya  
ya bi civîneke ji bo çapemeniyê diyar  
kir ku hikûmet di warê çareserkerina  
kêşeya kurdî û vegeandina gundiyan  
de ne ji dil e. Her wiha wî got: "Koç-  
beriyê mirov xistine rewşeke wisa xe-  
rab ku mirov ji begavî karên bêsincî di-  
kin, ji bo nanekî laşê xwe difiroşin." Li  
gorî gotina Yerlikaya li Elezîzê kesên  
ku ketine vî rewşê hene. Her wiha Si-  
nan Yerlikaya diyar kir ku li Xozata



Dêrsimê di saloneke dîlanê de 15 mal-  
bat bi hev re dimînin û ji derfeta xebatê  
bêpar in, ji nêz de ketine.

Li aliyê din IHD'ya Stenbolê roja  
7'ê gelawêjê bi daxuyaniyekê helwesta  
hêzên dewletê ya li hemberî mirovên  
kurd êşkerekî kir. Li gorf vî daxuyaniyê  
gundiyan Gajik û Harçatura Gêxiya  
Bîngolê serî li IHD'ê dane û diyar kirine  
ku gundên wan bi destê hêzên dew-  
letê hatine şewitandin.

### Kalekî 70 salî gulebaran kirin

Her wiha daxuyani li ser kirinên hê-  
zên dewletê du mînakên din jî pêşkêş  
dîke. Tê gotin ku kalekî 70 salî bi navê  
Şahin İlhan li Doğansaya Midyadê ji  
aliyê leşkeran ve hatiye gulebarankir-  
in. Dîsa li Arnavutköya Stenbolê mal-  
batekê serî li IHD'ê xîştîye û dide za-  
nîn ku hêzên dewletê bi lîdan û heqa-  
ret dest danîne ser antênê wan î peykê  
ji bo ku li MED-TV temaşe nekin.

Li ser vegeandina gundiyan li gun-  
dên wan Mazlum-Derê jî meha çûyî  
raporek amade kiribû, di vî raporê de  
hin pêşniyaran cih digirtin ji bo ku  
gundi karibin vegeandin gundên xwe ;

Divê ewletiya canê gundiyan hebe;  
gund ji nû ve bînin avakirin; ji bo ku  
gundi karibin debara xwe bikin, derfet  
bên peyda kirin; gundiyan gundên li

nik hev ji bo ewletiyê hewce ye karibin  
tevegerin; divê misogerî hebe ku wê  
careke din gund neyên valakirin; divê  
Rêveberiya ne-asayî û sistema cerde-  
vaniyê ji holê rabin. Di gel van pêwîst  
e mayîna û kemîna ku jiyana gundiyan  
tehdît dikin, bêne paqijkirin.

### Ji bo vegeerê aşî pêwîst e

Li aliyê din IHD ji bo vegeerê pêka-  
nîn van mercan dixwaze; Divê agirbes-  
teke duhêlî pêk were; tîmên taybet ji  
herêmê vekişin, efûyêke giştî derkeve;  
hemû qeyd û bendên li ber azadiya  
derbirinê rabin û divê di zagona bîngê-  
hîn de ji bo naskirina mafên kurdan  
guherînên pêwîst çêbin.

Em daxwazên wekî agirbesta  
duhêlî, efûya giştî, guhertina zagona  
bingehîn deynin aliyekî, hikûmetê ne  
dil heye ku rêveberiya ne-asayî rake,  
ne jî sistema cerdevaniyê belav bike.  
Jixwe hemû kesên ku ji bo vegeerê serî  
li rayedarên fermî didin, girtina çekan  
li wan tê teklîfkirin. Ji ber vî yekê jî  
vegeerê gundiyan negengaz e.

Îro mercên jiyana koçberan her roj  
giran dibe, di gel bêkarî û birçimayîne,  
nexweşiyên tîger jî rûdîdin. Li bajarên  
mîna Amed, Wan û Culemêrgê gelek  
zarok ji ber van nexweşiyên dimirin.  
Lewre ji qala serhildanên nû tê kirin.

SAMÎ BERBANG

# Ji bo berhevkirina zargotinî metoda zanistî

**X**ebatên ku di warê zargotinê de çêdibin, ji xwerûbûna xwe piçekî dûr in û ji bo ku lêkolîner karibe xebateke bi vî rengî bike, hewleke pêwist divê.

Berhemên zargotinê mîna; dûrik û helbestên gelêrî, çîrok, gotinên pêşyan, pêkenok, tištenok, metelok û hwd... bi xwe di nava jiyana gel de pêk hatine. Berhevkarî jî ancax bi xebateke zanistî dikare pêk were.

## Kêmasiyên di berhemên heyî de

Heta niha gelek xebatên di warê zargotina kurdî de çêbûne, mirov dikare bibêje ku piraniya wan ji pergaleke zanistî piçekî dûr in. Her çiqas ev xebatên ku çêbûne ji bo windanebûna zargotina kurdî pir girîng bin jî, piço piço ne û ji aliyê naverok û teknîka xwe ve, bi awayê nûçeyên rojnameyan hatine amadekirin. Divê mirov bi vî xebatê tenê nemîne.

Ev xebat bi saya rojname û kovaran bi zimanê kurdî an jî bi zimanê tirkî, ji devkî derbasî nivîskî bûne. Mînak: ji van kilam û destanên ku dengbêjan gotine; pêkenok, tištenok, metelok û gotinên pêşyan û hwd. ancax ji bo xebatên akademîk karin bibin bingeh.

Ji ber vî yekê ez dixwazim bala kesên ku li ser zargotinan dixebitin, dixwazin karê akademîk bikin, bikişînim ser çend xalan. Ji bo bijartin û berhevkarîya çîrok, tištenok, gotinên pêşyan, lawij, dûrikan tevî xalên ji hev cuda hene, gelek xalên hevpar jî hene. Bi awayekî giştî xalên hevpar ev in:

## Metoda ku divê bê şopandin

1. Der heqê gundên ku çîrok, tištenok, dûrik lê bê berhevkirin an jî bijartin de, pêwist e berhevkar xwedan agahî be

2. Der heqê kesên ku berhemên zargotinî jê bê girtin de pêwist e agahî hebe.

3. Di dema nivîsîna berhemên de divê lêkolîner hin qeydeyan li berçavan bigire.

Heke mirov van xalên ku me li jor rêz kirin, hinekî veke;

1. Di nava berhemên folklorê (zargotin) û dorhêlê wê de pêwendî hene. Berhevkarî û lêgerîn li ku

**Heta niha gelek xebatên di warê zargotina kurdî de çêbûne, mirov dikare bibêje ku piraniya wan ji pergaleke zanistî piçekî dûr in. Her çiqas ev xebatên ku çêbûne ji bo windanebûna zargotina kurdî pir girîng bin jî, piço piço ne û ji aliyê naverok û teknîka xwe ve, bi awayê nûçeyên rojnameyan hatine amadekirin.**



**Hinek biwêjên ku bi devokê herêmî bînin gotin, rastnivîs çewt be, lêkolîner dikare rast bike. Lê divê biwêj û saziya hevokên herêmî jî bînin parastin ji aliyê berhevkar ve. Mînak: Ji ajneberiyê re, melevanî tê gotin; divê berhevkar van herduyan jî binivîse û wekî wan bihêle.**

çêbibe, lêkolîner divê di wî warî de xwedî agahî be. Ger ev tune be, lêgerîner, der heqê berhemên zargotinî de nabe xwediyê agahiyên zanistî.

Mînak: Heke lêkolîn li gundekî çêbibe divê pirsên wekî; dûrbûna ji

bajêr; debara gundiyan bi çî dibe; gelşeya koçberî heye; saziyên gundên hevpar (bênderê gund, dibistan û hwd...), çend gundî xwedî zevî ne; li gund zeviya herî pir û hindik çiqas e? Ger lêgerîn van bi çî bîne, ji bo

xebateke zanistî bingehê qewîn amade kiriye. Ev ji bo xebatê destpêk e.

## Agahiyên der barê kesê çavkanî de

3. Kesê ku wê berhema zargotinî jê bê girtin, der heqê wî de hin agahiyê wekî temen, cih, cinsiyet; berhema ku dide nivîsandin ji ku aniye û hwd. pêwist e.

Her wiha ger derfet hebe, divê mirov bipirse ka ew berhem ji kê hîn bûye, asta gihiştîbûna wî çî ye, di warê çandê de jî di warê hêvotina giştî de çî wî/wê çî ye; yanê ew kes xwende ye an ne xwende ye; qet derketiye derveyî gundê xwe; di xebatê xwe de profesyonel e; wekî ji dorhêla xwe çîrokbêj û hunermend tê nasîn? Ger hunermend be, hunera xwe ji kê hîn bûye û bi çî aletî xebatê xwe didomîne?

## Li ser helwesta berhevkar

3. Ji bo ku xebat bi zanistî bê nivîsandin, divê lêkolîner ne alîgir be. Tiştên çê û yê xerab neke nava xebatê; divê berhemên ku tê nivîsandin nebe grûbên çê û yê xerabiyê. Berhem ji aliyê ehlaqî ve çî îfade dike, ne karê lêkolîner e.

Ji bo berhevkar hemû berhem birûmet in. Kesê ku berhem jê tê standin divê nekeve bin bandora lêkolîner. Lêkolîner divê bibaldar be da tu tiştêkî kêm nemîne û di vî warî de hemû pirsan bike.

Lê berhevkar ne mecbûr e ku girêdayî devokê herêmî be. Hinek biwêjên ku bi devokê herêmî bînin gotin, rastnivîs çewt be, lêkolîner dikare rast bike. Lê divê biwêj û saziya hevokên herêmî jî bînin parastin ji aliyê berhevkar ve. Mînak:

Ji ajneberiyê re, melevanî tê gotin; divê berhevkar van herduyan jî binivîse û wekî wan wekî wan bihêle.

Piştî ku lêkolîner an lêgerîner ev taybetî hemû bi çî anîn, ji bo xebateke zanistî tiştêkî din heye:

Divê ew nav û paşnavê xwe, xebat di kîjan dîrokê de çêkiriye binivîsîne. Ancax xebateke bi vî awayî zanistî ye ji bo zargotinê; bi gelemperî û bi taybetî jî, ji bo zargotina kurdî.

FEREC KUREŞIVAN

# Dahûrîna peyvvan (2)

**Kebanî:**  
**Peyv hevedudanî ye û ji du hêmanan çêbûye: "key" û "bano."**  
**"Key" di wateya qral de ye û "bano" jî di wateyên xanim, qralîçe, prenses de ye. Çawa ku di destana Memê Alan de Tavbano, Hîvbano, Stêrbano wekî keçên keyê firîşteyan tîn pêşkêşkirin.**  
**Îro peyva "keybano" bi awayên cur bi cur tê bilêvkirin; mîna "kevanî", "kebanî", "kewanî" û hwd.**  
**Ji hêla din ve jî, ji aliyê wateyê ve ev peyv ango "kebanî" di şûna "bermalî"yê de tê bikaranîn.**

**D**i vê nivîsa xwe ya duyemîn de jî, em dê xebata xwe ya li ser dahûrîna peyvvan (tehlîla kelîmeyan) berdewam bikin. Çawa me berê jî gotibû, hin peyv hene ku bi domana demê re, hem ji aliyê teşe û dirûvê ve û hem jî, ji aliyê wateyê (maneyê) ve dageriyane û ji rastiya xwe dûr ketine.

Bêyî ku em dirêj bikin, em dê dest biavêjine dahûrîna peyvvan:

**Birazi û xwarza:** Ev her du peyv jî, peyvên hevêdudanîne û radeya lêzîmtiyê didin xuyakirin. Em pêşî peyva birazi hildine destê xwe.

Peyv ji "bira" û "za"yê hatiye pê. "Bira" jixwe tê zanîn, em dê tenê li ser "za"yê rawestin. "Za", ji lêkera zan, zayîne hatiye bidestxistin.

Di farisî de, di şûna "za"ya kurdî de "zade" tê bikaranîn; ku ew jî, ji "za" û "de"yê çêbûye.

Ew parkîta "de" di kurdî de jî heye. Wekî talde (*tal+de*). Tal li vir di şûna "vala" de ye, ku hem kurmançîxêv û em jî kirmançîxêv wê bi kar tînin.

Piştî van daxuyaniyan, em dîsa werin ser peyva "birazi". Ev peyv ji bo zarokên birayan (çi yê kekan û çi jî ji bo birayên biçûk) tê bikaranîn. Ew zarok çi keç û çi jî law bin. Gava ku keç be jê re "biraziya min" tê gotin, gava ku law be jî îcar "biraziya min" tê

gotin.

Der barê teşe û dirûvê peyvê de jî em li serê bisekinin. Peyv çawa ku ji "bira+za" pêk hatiye, bi qonaxa demê re li "birazi" dageriyaye.

Îcar em peyva "xwarza" hildine destê xwe. Bêyî ku em zêde peyvê ji hev bikin, em dê ramanên xwe der barê wê de bibêjin. Ji ber ku her du peyv di eynî rewşê de ne.

Peyv ji "xwar" û "za"yê hatiye pê. "Xwar" di wateya xwişk, xweh û xwengê de ye. "Za" jî, wekî ku me li jorê daxuyand jî lêkera zan, zayîne hatiye bedestxistin.

Ev peyva hanê jî, ji bo zarokên xwişkê an hetê (xwişka mezin) tê bikaranîn, çi keç û çi jî kur bin. Mîna "xwarziya min" an "xwarziya min."

Li vir em vê jî bibêjin ku, warê bikaranîna her du peyvvan jî fireh e û li gorî radeya kesan, di malbatê de tê bikaranîn. Nimûne: zarokên pismam an jî dotmamên mirov jî, ji mirovan re dibin xwarza an jî birazi.

**Kengê:** Ev peyva hanê jî, ji du hêmanan, hatiye pê. Em bi hêsaniyê peyvê dikarin wiha dahûrînin: "çi" û "heng." Li vir "heng" demê îfade dike û "çi" jî, cînavka pirsyarkî ye.

**Kebanî:** Peyv hevedudanî ye û ji du hêmanan çêbûye: "key" û "bano." "Key" di wateya qral de ye û "bano" jî

di wateyên xanim, qralîçe, prenses de ye. Çawa ku di destana Memê Alan de Tavbano, Hîvbano, Stêrbano wekî keçên keyê firîşteyan (perî) tîn pêşkêşkirin.

Îro peyva "keybano" bi awayên cur bi cur tê bilêvkirin; mîna "kevanî", "kebanî", "kewanî" û hwd.

Ji hêla din ve jî, ji aliyê wateyê ve ev peyv ango "kebanî" di şûna "bermalî"yê de tê bikaranîn.

**Melkemat:** Peyv ji du hêmanan "melek" û "mewt"ê hatiye pê. Her du jî erebî ne û di şûna "rihistîn" de tê bikaranîn, ku qest jî Ezraîl e. "Melkemat, wekî "nêrkemat" jî tê bilêvkirin. Em li ser peyva "mewt"ê jî rawestin, ku ew tê wateya "mirin" a kurdî.

**Çawa:** Ji sê hêmanan hatiye pê. Ji "bi", "çi" û "awa" an jî "hawa". Bi qonaxa demê re li "çawan" an jî "çawa"yê dageriyaye. Li vir "bi" daçek, "çi" cînavka pirsyarkî û "awa" an jî "hawa" navdêr e. Li hin deveran di şûna "awa" de "hawa" jî tê bikaranîn. Nimûne bêhawa, ev rengdêr e û di wateya "bêşekl" de ye. Bi taybetî jî bo kesên li ser soza xwe namînin, li her milî lê dixin û ku mirov bi wan nikare ewle bibe.

ZANA FARQÎNÎ

## Ka emê kengê vegerin?

FIRAT CEWERÎ



**M**in van rojan biranînen Dr. Nûredîn Zaza bi tirkî xwend. Ew bi wergera Aytêkîn Karaçoban û di nava Weşanên Mezopotamyayê de derketiye. Çîroka jiyana wî ya bi trajedî tesîreke ecêb li min kir. Min di çîroka jiyana wî de resimekî heftê salane yê kurdan dît. Resimekî reş... Resimekî ku pêwistiya ponijandina rewşên birên kurdan li ser heye. Nûredînê zarok piştî şikanidina Serhildana Şêx Seîd mecbûr dimîne ku bi kekê xwe Dr. Nafîz re welatê xwe terk bike û piraniya jiyana xwe li sirgûnê bidomîne.

Nûredîn ji malbateke aristokrat ya kurd tê. Kalikê kalikê wî bajarê Madenê ava dike. Piştî ku dewleta Osmanî ji kalikê wî aciz dibe ordiyê leşkerên xwe dişîne ser, da ku wî ji Madenê derxîne. Ew ji bo ku pêşî li wêrankirina bajarê Madenê bigire, li ber ordiyê dest hilnayne, kincên derweşan li xwe dike, berê xwe dide welatê Yemenê û piştî bi salan (mayîna) li wir di nava bédengî û tenêtiyê de wêfat dike. Nûredîn Zaza ji dil behsa vî kailikê

kalikê xwe dike. Bermayê vî kalikî, yanê bavê Nûredîn Zaza jî xwende bûye û li gorî dema xwe rewşên birêkî kurd bûye. An jî ji rewşên birîtiyê wêdetir aristokratekî kurd î Osmanî bûye. Mirovekî bîrbir, sergiran, welathez û dûrbîn bûye. Ew mirovekî dostê ilim û dijminê nezaniyê bûye. Lewma ew zarokên xwe dide xwendin û tu carî dîrî huner û edebiyatê namîne. Nûredînê ku di malbateke wiha xwende û rewşên birê de digihê, bivê nevé bal û meyla wî jî li ser xwendinê heye, di jiyana xwe ya sirgûnê de jî hema ku firsenda wî çêdibe, ew dixwîne. Lê ew bi tenê bi xwendinê jî nayê ser; ji bo hişyarkirin û ji nezaniyê û stemkariyê rizgarkirina kurdan jî, mecbûr dimîne ku xwe biavêje nava siyasetê. Lewma ew li her sê-çar welatên dagirkerên kurdan di heps û zîndanên de dimîne, îşkence û neheqîya dinyayekê dibîne.

Nûredîn Zazayê ku di deh-diwanzdeh saliya xwe de dev ji welatê xwe berdaye, di navsaliya xwe de dixwaze lê vegere û li wir dest bi jiyaneke nû bike. Lê belê piştî kurt-edemekê serê wî bi karbidestan re dikeve belayê û dîsan mecbûr dimîne ku welatê xwe terk bike û li Ewropayê bi cih bibe. Gava ew cara dawî ji Tirkiyeyê derdikeve û xwe digihîne Swîsreyê, mîna ku gihîştibe azadiya xwe, bêhnêkê ji dil berdide û hezkirina xwe ya ji welatê xwe yê azad, ji Swîsreyê re tîne ziman. Lê wekî mirovekî kurd, ew trajediya kurdan a heftê salên dawî jî tîne bira mirov. Heftê salên

bi kuştin, bi êş û elem, bi koçberî û sirgûnan ve tijî... Koça me ya dawî koça hêştêyî ye. Bazdayên vê koça hêştêyî, ji xwende û rewşên birên kurd pêk tê. Xwende û rewşên birên ku ji avisbûneke bi qolincên xurt zane çêbûne. Li welatên paşmayî gihandina rewşên biran karê herî zehmet e. Komêk rewşên birên ku ji vî karê zehmet hatiye holê, îro her ku diçe ew û welatîyên xwe ji hev bi dûr dikevin. Em bi hesreta welêt û bi hesreta vegeerê dijîn. Lê dem û dîrok li benda me ranaweste. Welatê guhertin, bi zorê an bi xweşî jiyana gundîtiyê ji navê radiibe, jiyaneke bajarvanî li welêt dest pê dike. Kal û pîrên dema me wêfat dikin, zarokên ku piştî me çêbûne, îro bûne keç û xortên gihîştî. Hevalên me yên ku mirine, yên hatin kuştin û yên ku baz dane. Malbatên me, ji hev dûr ketine. Nas, meriv û malbatên gelek an ji me ji welêt bar kirine, li bajarên mezin bi cih bûne. Niha, welatê ku di xeyala me de ye dîrî resimê zarokî û xortaniya me ye. Her rojêke ku derbas dibe, me û welatê me ewqasî ji hev bi dûr dixê, reheke me diqete. Xewn û xeyalên me, fantazî û daxwaziyan me û welatîyên me ji hev bi dûr dikevin. Em li biyanistanê bi hesret û evîna welêt dijîn. Di nava jiyaneke modern de, em li nostaljiyê digerîn; dilê xwe pê xweş û şa dikin.

Bi hêviya hevdudîna li welêt û li welêt geşkirina ziman, edebiyat û kultura kurdî...

# Rengê rêveberiya tirkan



Di pergala dewleta tirk de sîmgeya artêşê "Seyfiye" tê zanîn. Maneya wê jî di ferhenga osmanî û tirkî de şûr e. Nivîskar Çetin Altan di pirtûka xwe ya bi navê "Rûyê Dîrokê yê veşartî" de, serbirîn çawa nav û nexşek e ji wan re.

**B**inemala osmaniyan artêşa xwe ya bi navê Yeniçeri, bi piranî ji zarokên hindikahiyên Anadolê pêk anîbûn. Ev hê bi zarokî ji malbatên wan bi darê zorê dihatin veqetandin û di leşkergehan de dihatin mezinkirin. Di dilê wan de ne "tîrsa Xwedê", ne jî hezkirina mirovan dima. Dirûşmeke wan a navdar hebû. Dema bigotana "Em naxwazin" (istemeyîz) padişah li ser textî dihatin xistin, weris dikete stûyê serokwezîran û şehzade di dergûşan de dihatin xeniqandin. Di dema padişadên nû de, ger cûlûsa wan bi dilê wan nebûya, an jî kêmbidîtana, dimeşîyan ber sarayê û bi kepê xencerên xwe ve bi wan dileyîstin.

Osman ê II, Selîm ê III. û hin kes bi destê yeniçerîyan hatin kuştin. Di dîroka osmaniyan de her wekî şûrê Demokles, li ser serê padişah, serokwezîr û wezîran radiwestiyan. Ew her dem di bin tîrsê de digirtin. Ew şehzadeyê ku xwe helpesandiba wan, ew diçû ser textî, yê din jî stûyê xwe dirêj dikirin bin şûr û xencerên wan.

Sultan Mehmed xwest ku wan bide hilweşandin, lê rehên wan bi temamî ji bingehî nedane hilweşandin û neanî der. Di dîmahîka belavbûna împaratoriye de komara nû jî mixabin careke din bi destê hin paşayên xwînaxwar ên ku di wî kuçikî (kurik) de mezinbûyî ve

hate saz kirin. Zagonên bingehîn li gorî borîn û berjewendiyên xwe pêk anî. Maka zagona paşayan bi destê kirêgirtiyên xwe dane çekirin. Sê caran parlementerên di bin siya wan de hatî hilbijartin jî şandin malên wan. Sê caran jî qifil xistin dergehê parlamentoya destûrdarî. Serokwezîr jî li ber çavên dinyayê kêşandin sêpê û hilavêstin.

## Rayedarên sivil piştî leşkeran tîn

Di 70 salan de, di nav 9 serkomaran de 7 jê leşker bûn. Herduyên din jî piştî destên xwe ji wan re danîne ser singê xwe, rûniştin li Qesra Çankayayê. Bi navê Ewlekariya Dewletê civatek çêkirin. Di nav wê hêzê de jî zêdehiya endaman ji leşkeran bû û hemû biryar wekî dîtî û daxwazên wan hatin wergirtin. Di civînên fermî de wezîrê berevaniyê wekî xulamêkî ku li paş axa bimeşe, ew jî dîwajokê serokê artêşê ye.

Ji bo hemû êrîşên ji derve û ji nav ve, biryaran bi serê xwe didin. Ew meclîsa ku li ser dergehê wê nivîsandî "Serwerî bêqeyd û merc ya gel e" çend rojan bi şûn de agahdar dikin. Hikûmeta Tansuyê, par biharê çuyîna leşkeran a başûrê Kurdistanê, ji rojnamevan û ajansên biyanî bihîst. Ji ber ku di xîmê xwe de komar komareke leşkerî ye. Zagonên hilbijartinê jî, wan dane çekirin. Yê ku di dîtîna wan de nebin di kunên

bêjîngê de naçin xwarê û rûnanin li ser wan kursiyên. Yê ku di diduyê adara 1994'an de parlementerên Partiya Demokrasiyê (DEP) ji meclîsê avêtin derve jî ew bûn.

Yê ku di destpêkê de rêka zilamê "Pergala Adil (Adil düzen)" jî birîn dîsa her ew bûn. Mêjû dide xuyan ku qerqêşe û aloziyên nav welat ji bo wan her bûye derfet, sedemê ferman û talanê.

## Leşkerên tirk li ser rêça kalikên xwe ne


Di cenga Kurdistanê de leşkerên dagirkeran serê hin gerîla yê birî hilgirtibûn destê xwe, wêne pê dabûn kişandin. Li ser weşandina wan, xwe li ber rexneyan nikariyan bigirin. Har û dîn bûn, belavok belav kirin û xwestin rûyê xwe yê hov ji dinyayê veşêrin. Di xwendîngehan de bîrdoza dijminahiya gel; koçberkirina mirovan, valakirina gundan, zordarî û kuştinê nişanî mirovan didin.

Di pergala dewleta tirk de sîmgeya artêşê "Seyfiye" tê zanîn. Maneya wê jî di ferhenga Osmanî û tirkî de şûr e. Li jêrê ez dê çend mînakên serfirandinê pêşkêş bikim. Ew jî bi pênuşa nivîskar Çetin Altan. Binêrin birêz Altan di pirtûka xwe ya bi navê "Rûyê Dîrokê yê Veşartî" de, serbirîn çawa nav û nexşek e ji wan re.

"Serê serokwezîr Ehmed Paşayê kurê Dûkân bi destê axayên sarayê hate birîn". "Yavûz Selîm di cenga Misirê de serê serokwezîr Yûsif Paşa da birîn û serê jêkirî sê rojan li gel xwe gerand". "Serê Serokwezîr Îsmail Paşa, Rodosê Celadî firand. Serê wî yê birî şandin Stenbolê", "Serê Serokwezîr Elî Paşayê Çorluyî li Midîlliyyê hat birîn û serê wî şandin Stenbolê", "Serê Serokwezîr Gurcî Mehmed Paşa piştî ku jê kirin, li Vîdosê danî ber padişah", "Cesedê Serokwezîr İbrahim Paşayê Nevşehirî yê bêserî, li Meydana Sultan Ehmedê hate parçekirin", "Cesedê Serokwezîr İbrahim Paşayê Kabakûlakî li Girîtê hate birîn û şandin Stenbolê", "Serê serokwezîr Behrî Mistefa Paşa li Midîlliyyê hat jê kirin û anîn Stenbolê", "Serokwezîr Şerîf Hesên Paşa di xewê de hat kuştin û serê wî yê jêvekirî anîn Stenbolê." Serê Şehzade Qasim yê birî ji Padişah Yavûz re şandin.", "Serê Silêman Çelebî yê birî ji birayê wî Mûsa Çelebî re, paşê jî serê Mûsa Çelebî jî ji birayê wan yê din Mehmed Çelebî re şandin."

Ev hema tenê çendek bûn ji "rûyê dîrok a veşartî" kesên ku bixwazin serbir û xwînexwaran binasin bila pirtûka birêz Altan bixwînin. Ka serbirîn karê kê ye?

Î. CÛLEMÊRGÎ



● **Di Gelawêja 1978'an** de kovara 'Xebat ji bo Rizgariya Kurdistan' hate derxistin. Kovar, weşana Partiya Demokrat a Kurdistanî Tirkîyeyê (PDK-T) bû. Piştî kongreya partiyê ya 1977'an ev kovar hatiye derxistin. Kovar bi tirkî bû, lê hin nivîsên bi kurdî jî tê de cih digirtin. Kovar bi awayekî nehênî li ser kaxîzên teksîrê dihate zêdekirin. Li ser hejmara kovarê ya pêşîn ev nivîs cih digire: "Hemû karkerên dinê û gelên bindest yek bin!" Piştî kongreya PDK-Tê ya 1981'an navê partiyê diguhere, dibe "Rizgarîxwazên Neteweyên Kurdistanê (KUK)". Li ser kovarê jî hin guherîn çêdibin; ji hejmara 7'an pê de ebatên kovarê biçûk dibin

û li ser jî ev nivîs cih digire: "Kovara Navendî ya Rizgarîxwazên Neteweyên Kurdistanê".

● **Gelawêja 1991'an**, Kovara NEWROZ dest bi weşanê kir. Kovar ji sê mehan carekê hatiye weşandin; ji 64 rûpelan pêk hatiye û bi kurdî-tirkî derketiye. Kesên wekî E. Sebat, Huseyin Kûrekçi, Edip Polat di vê kovarê de nivîsandine.

● **22.8.1992'an** ku li Şirnexê serhildaneke girseyî pêk hat, îcar dewletê jî bo ku careke din tiştêkî bi vî awayî neqewime li herêma êrişê li ser gel zêdetir kirin. Gel jî li hemberî van êrişan zêdetir li hemberî dewletê li ber xwe da.

AWIR

# Mewlewî û siruşt

**Mewlewî nawî Abdulrahman Mela Seîd e, le salî 1806 le gundî Tawegoz hatote dînya. Le salî 1882, le temenî 76 salî da, le Nawçey Serşate jiyani xoye xakî Kurdistan aspêrê.**

**L**êre da bêguman Siruşt çiray ronakî hemû hozanwanêke ke bizwênerî hest û sozî derûnêtî, çi hozanwan yan hunerzan, ke temaşayî dimenî ciwanî Siruşt deka, hestêkî bizwêner le naxî sozîyewe hel equlê û decoşênê, naçar debê ew soz û heste be şewey şîir yan stran le derûniyewe der bixat.

Lêre da mebestim ziyatir le ser hozanwanî kurdî mezin, mamostay nemir Mewlewî ye .. ke çon Siruşt û dimenî ciwanî Kurdistan, hest û derûnî Mewlewî .. Bizwandûwe û kewtote têrwanî-nî siruştêkey dewr û piştî xoy her wek sofî û dêwane kewtote basî ciwanî siruştêkey.

Lêre da be pêwistî ezanim, basî ewe bikem ke çon peywendî xoşewistî le nêwan xoy û siruşt hatote kayewe, be radeyek ke hozanwan Mewlewî destberdarî xo debê û dergay frawanî dilî exate ser pişt, bo ewînî dildarî nêwan yan ew perî guncawî û hogirî nişan bidat. Hozanwan be radeyek peywendî-yekey tîni girtûwe ke çî tir be rûkêşî temaşay siruştî nekirdûwe, belku le şîrekanî da deçête naxî siruştewe ke le wesfî serzarekî detrazê û têper dekat, degate derbrînî hest û nest û soz û ewîn.

Hozanwan lêre da arezûy betînî le ast ewindarî da asoy siruştostî geyîştote radeyek ke xoy, jiyân, soz, ewîn, bîr endêşey, hemû heste mirowayetiye-kanî da derêjete ser siruşt da û îtir be her layêk da temaşa bikay le şîirî Mewlewî debînî, her Gule pêdekenê û Ne-

mam û Direxte sema deka awe û awaz deçrê...her wek lem honraweye da derî xistûwe..

*Weharen, teşrîf xal xasan pey herd kem kem ciwanîş awerd, pîrîş berd cem cem Sosenan çî taq tewq werdan ser dan neherdan perê ham ferdan we ruy zaxan da çinur lul werdan pey pay Giyan tor dam amade kerden bereza bew çîn tuxray ta ta we Şemal mişa noş, yanî: wey lawe Nergiz we mes mes midê û: Ken ew kes koşey çak dil wer nedo çe des*

Mewlewî helbestwan cige lewey tabloyekî rengînî pir le wêney heme corey cuwan û dilgirman bo dekêşê, ke serinc rakêş û xem rewên bê debînî jiyân degate ser dimenekanî tobloke wek komele mirwêkî hestiyar û be soz nişan dide.

Le paş em lêkolîneweye hez dekem be kurtî basî jiyânî şairî berêzî asimanî kurdayetî bidwêm.

Mewlewî nawî Abdulrahman Mela Seîd e, le salî 1806 le gundî Tawegoz hatote dînya, seretay xwendinî le lay bawkî xo dest pê kirdûwe, payan le Nodşe cuwete xîwendinî feqêti her be ewdalî xîwendin serî le gelê bajarê û gunda dawê. Gelêk karî mezinî be dest girtûwe û aştî nêwan xêlanî kurdî be encam geyandawe. Ta le salî 1882, le temenî 76 salî da, le Nawçey Serşate jiyani xoye xakî Kurdistan aspêrê.

DILÊR

# Bilind El Heyderî wefat kir

**H**elbestvanê Iraqî yê mezin, Bilind El Heyderî roja 6'ê gelawêja 1996'an li nexweşxaneyê Londonê mir.

Ew sala 1926'an li Bexdayê ji dayik bû, di sala 1966'an de berê xwe da Beyrûdê û li wir di rojname û kovarên erebî de kar kir. Sala 1977'an çû Londonê û li wir ma heta roja mirinê. Ew yek ji mezinîrîn helbestvanên ereb, ji yên sedsa-la bîstan tê jimartin. Ji ber ku wî pir xizmeta zimanê erebî kir û gelek diwan çap kirin, ku roleke wan a girîng di pêş-

xistina ziman û toreya erebî de hebû. Ew bi eslê xwe ji kurdên Başûrê mezin e, lê mixabin, tu carî di helbestên xwe de nêzikî pîrsa kurdayetiyê nedibû. Û her digot: "Zimanê kurdî têrî min û hestên min nake."

- Berhemên wî:
- Gupegupa heriyê, 1936
- Sirûdên bajarê mirî, 1951
- Hûn bi berbangê re hatin, 1961
- Gavin di xerîbiyê de, 1965
- Riyên sirgûniyê, 1996
- Û gelek pirtûk û diwan û gotarên din.

# ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YÎÇÎT



## Diyalektîka di navbera doh, îro û sibeyê de

**K**esên Christopher Caudwel nas dikin dizanin ku ew rewşenbîrsekî navdar e. Ew behsa du celeb rewşenbîran dika: "Rewşenbîrên li doh mane û yên di wêbêyêke (ayande) dîr de dijîn".

Rewşenbîr hene nagihin roja xwe, nikarin bi roja xwe re bin. Li pey îro tîn, çend gav û çend kilometreyan bi dû zemên de dikulin. Hin jî berevajî, bi siberojêke xeyalî û nependî mijûl in.

Li vir pîrsa esasî ew e ku ev her du tîp jî ne bi zemên re ne. Sebra wan li zemanê hazir nayê. Yek, di nav nesaxan de, kes û mirovên ne di jiyânê de bêhna xwe derdixe, li wir li aramî û hizûra xwe digere. Yê din jî hez ji xewnan dika, ji reşkûtarî dika û jî dîr de destên xwe ji civatê re dihejîne.

Yek tu wî bikujî lingên xwe dide erdê û "ev der nivê dinyayê ye, hûn çermê min li serê min kom bikin ez gavekê ji vir û pêşdetir navêjim. Dev ji min berdin. Herin. Hûn doza çî li min dikin" dibêje. Yê din direve, fişik û kezebê li xwe diwerimîne. Ne li pey xwe dinêre û ne jî kerwan û rêwiyê bi rê de meraq dika. Ling bavê min ling, dawa xwe dixê devê xwe dibeze û ha dibeze. Yek bi doh dilebika û îro ne di bala wî de ye û yê din jî li ku rûne, gotin û sohbet li ser çî dibe bila bibe, ew her qala xewnên xwe dika. Yek jî zemên bi gazin e ji ber ku zeman bilez e û yên din hêrs û tore ye ji ber ku zeman cangiran, dixwemedîtî û bêhnfireh e.

Baskekî sêhem jî heye ku li gori hewcedariyên tevgera rizgarîxwazî û aktûelbûna van hewcedariyan (ev hewcedarî dikarin siyasî bin yan jî kulturî, edebî, fikrî û diplomatîkî bin) hewl dide rola xwe bilîze. Ev bask xwe bi zemanekî sînor nake. Ne li doh xwe jî bîra dika û ne jî di nav xewnerojkan de sal û dehsalên xwe dispêre hev.

Carina serekî li doh dixê, bala xwe dide rê û şivîla doh, firêze û paleya doh held-isengîne, ders û netîceyan derdixe. Carina jî firekê dide xwe diçe pêşerojê, çî heye û çî tune ye saxtî dika û vedigere îro. Belê cihê aktûel, gasîna kêferatê, guhertin û avakirinê îro ye. Ev alî, vê baş zane ku bihayê doh ne bi tenê di destê doh de ye. Îro jî tim li ser doh û sibehê xwedî gotin e. Wezin û nixêr doh û demana sibehê pir girêdayî îro ye, meş û tempoya îro, dereceya çareserkerîna pîrs û pîrsgirêkên îro û heq derketina ji wan e. Helbet rewşenbîrêkî ku karê wî pêdaketina zemanê buhurî ango dîrok e, yekî ku lêkolînerê wêbê û pêşerojê ye û siyasîyekî ku bi her cure pîrs û pîrsgirêkên zemanê li dar re li hemberî hev e û divê çarepêdekir be, dê bi mêzên û pîvanên cihê meseleya zemên binirxînin.

Malzemeyê dîroknivîsan ne "ya ku dibe", her wiha ne "ya ku dê bibe", belê "ya ku bûye" ye. Divê çarçoveyê de dîroknivîsek û hin caran jî lêkolînerêk bi mijûlahiyên xwe li doh in, lê ev mijûlahî li doh jî bin, zêdetir ji bo îro û pişt re jî ji bo pêşerojê ne. Mirovê bi zemên re ye, ji noqta îro û pîrsgirêkên jiyana îro, li dîrokê û li wêbêyê dinêre û di nav doh û sibehê de dibe pir û xelekek saxlem. Têkiliya xwe berdewam bi doh re diparêze û seraqet vê têkiliyê bi nû ve dika. Li aliyekî jî bala xwe dide pêşerojê û xwe di vî cebhî de jî naşemirîne, sersarî û bêxemiyan nake.

Helbet ev kategorîzekirîna sêşaxî mîna her kategorîzekirîneke din pir giştî û gelemperî ye. Mirov di nav xwe de dikare van şaxan bike çend serşaxên din û bi nimûneyên li jiyânê jî muşexestir bike. Niha bila ewqas be.

Tiştêkî din ku gerek bê gotin ev e ku mirovek çendî di nav doh de noq be û çendî di nav ya bihurî û bûye arşiv de rabe û rûne jî, careke din jî xwe ji zemanê xwe nikare qut bike, xwe nikare dawîşîne Li welatê me ji her welatî zêdetir doh û sibe bi rengêkî ku nayên muqayesekirin bi îro ve hatine girêdan. Bi qasî tiştê em îro dikin doh dibe yê me û xetera li ser doh sivik dibe û careke din bi qasî tiştê me îro kir, riya me vedibe û pêşeroj û asoyê me rohnîtir dibe. Hin kes behsa xayîntiya bi zemên re dikin, gerek mirov bi zemên re ne xayîn be, dibêjin. Ev rast e. Ji bo vê jî ewil divê tarîfêke mirov hebe ji bo zemên û mirov li ser zemên xwedî fikrek rast û ilmî be. Ya duhem divê mirov diyalektîka nav zemanê buhurî, zemanê pêşerojê û zemanê hazir û bandora wan li ser hev baş nas bike.

Berpîrsê MED-TV'yê İlhan Kızıllhan:

# Wê dengê me

# ji her demê bilintir be!

**MED TV ji nû ve di 15'ê Gelawêjê de dest bi weşana xwe ya asayî kir. Berê rojê 6 saet weşan dikir, niha jî saeta weşana xwe derxistiye 8'an. Li ser vebûna televîzyonê nimîndeyê me yê Ewrûpayê MAZHAR GÛNBAT bi Berpîrsê MED TV'yê İlhan Kızıllhan re peyivî.**



**W**ekî gerinendeyê televîzyonê, tu dikarî der heqê rewşa dawî ya televîzyonê de xwendevanên me agahdar biki?

□ Wekî tê zanîn, MED-TV ji 2'yê meha tîrmehê ve bi awayekî fermî û fiilî hate girtin. Ji destpêka weşana me ve dewleta tirk kampanyayeke mezin li dijî me di qada navneteweyî de dabû destpêkirin. Li cem hemû sazî û berpîrsên dewletên Rojava ji bo ku dengê me bibire, digot "Med, televîzyona terorê ye" û hwd.

Di destpêkê de bi ser neket, ji ber ku komîsyona ITC'yê li bernameyên me her roj temaşê dikir, kontrol dikir û didit ku çu ferq di navbera televîzyona me û yên din ên cihanê de tune. Ji ber vê yekê jî zêde guh nedida propaganda û daxwazên dewleta tirk. Digo-tin girtina MED'ê karekî dijhiqûqî ye.

Em bawer dikin ku televîzyona me wekî standarta televîzyona BBC, MBC û hwd. weşanên xwe dike. Ew gelê kurd û yên Rojhilata Navîn agahdar dike. Cara yekem e ku televîzyoneke wisa pir-reng, hem ji aliyê ziman û hem ji aliyê çandê ve weşanê dike.

Gelek netewe û hindikahiyên bindest ên Rojhilata Navîn, ji televîzyona me sûd werdigirin û yên negirin jî derî ji wan re vekiriye ku dengê xwe tê de bilind bikin.

Şirketên Ewrûpa yên peykan jî, ji vebûna televîzyonekê di warê aborî de gezeceke mezin bi dest dixin. Xuya ye dewleta tirk ji MED TV'yê zêdetir pere dane van şirketan ji bo rawestandina wê. Gelo armanca Tirkîyeyê çi ye, ji bo xwe heja dibîne ku ew çend pere bide da ku televîzyon ji bo demêke kin

bê girtin?

□ Eger mirov ji aliyê medyayê ve binirxîne, wê bibîne ku MED-TV xwe digihîne hemû malên ku dixwazînin me temaşê bikin û rastiye fêr bin.

Em agahiyên alternatîv û nû didin gel, ji ber vê yekê esas em dengê med-

yekcar bê girtin? Yanê ew nizane ku ew girtina televîzyonê zêde najo?

□ Em tev dizanin ku li Tirkîyeyê şerekî taybet tê meşandin. Ew çiqas karibe dengê kêmbike jî, dengên heyî, çawa ku li kolanên bajarên Kurdistanê di her fersendê de rojnamevaneke dikuşt, ji bo xwe baş dibîne, ji ber

**Niha Tirkîye bi Fransayê re peymaneke bi 4 milyar dolarî imze kiriye, ji bo karekî di warê telekomunikasyonê de.**

**Di vê danûstandinê de Tirkîye îhaleyê mezin dida şirketeke fransîz bi wî şertî ku Fransa rîya weşanê nede televîzyona MED'ê.**

yaya dijber in. Em ne wekî şirketeke bazirganiyê ne. Ji ber van egeran, dewleta tirk vê yekê ji bo xwe pir bi xetere dibîne û ji bo rawestandina MED'ê hemû derfetên xwe seferber dike.

Hêviya Tirkîyeyê heye ku MED-TV

vê yekê dev ji êrişên wisa bernade, welaw ku zanibe ev ne çare ye jî. Girtina MED'ê wextî be jî ew ji bo xwe wekî fersendeke bêhempa dinirxîne.

Mesela di demên dawîn de, medyaya tirk çî nûçeyên di MED TV de hatibûn weşandin, li gorî xwe diguherî-

ne, berevajî dike û ji nû ve diweşîne.

Gelo dewleta tirk bi serê xwe televîzyon girt? Yanê di girtina MED'ê de heparên sûcê wê tune bûn?

□ Bêguman dewleta tirk jixwe bi serê xwe nikare tiştekî wisa bike, dewletên rojavayî heparên sûcê wê ne. Berjewendiyên dewletên rojavayî li Tirkîyeyê li ber çav tînin girtin. Piştî hilweşîna Sovyetê, niha daxwazên Fransa, Almanya, Bîrîtanya ne mîna yên berê ne. Ew bi xwe jî berjewendiyên xwe yên neteweyî diparêzin. Lewma jî dewleta tirk bi vî awayî dikare ji aliyê siyasî û aborî ve zixtan li wan bide da ku alikariyê bidinê.

Dewleteke mîna Almanya ku heta meha çaran peyk dabû me, bi mazere-ta ku em li dijî wan kar dikin peyk ji me stand. Yanê esas ev mesele ne tenê aborî lê her wiha meseleyeke mezin a siyasî ye jî.

Bi qasî tê zanîn, li welatên rojava dewlet êrişên rasterast û qaba nabin ser medyayê, bi taybetî ew êrişên pir bi taktîk û hostane li hemberî sazî û dezgehên ragihandinê bi kar tînin. Feqet me dît ku tewra van welatan li hemberî MED'ê mîna ya dewleta tirk bû. Gelo li Ewrûpayê demeke nû dest pê dike, an jî ev tewra wê bi taybetî li dijî medyaya kurd wisa cihêreng bû?

□ Hem dewleta tirk hem jî yên Ewrûpayê ketin nav şasiyê mezin. Ewrûpa ji bo berjewendiyên xwe yên li Rojhilata Navîn naxwaze navbera xwe û Tirkîyeyê xera bike. Lê belê li hemberî Tirkîyeyê tewrên hemû welatên rojavayî ne mîna hev in.

Ez mînakekê bidim. Dema Çiller serokwezîr bû hate Ewrûpayê û li Parlementoya Ewrûpayê soz da ku ewê ber bi demokrasiyê ve gavên girîng biavêjin, ji bo ku Tirkîye bikeve nav Yekîtiya Gumrukê.

Lê niha em dibînin ku tiştên berevajiyên gotinên Çiller in li Tirkîyeyê rûdîdin. Gelek parlementerên ewrûpî niha êskere dibêjin ku Çillerê ew xapandine, yanê ew jî nizanin dewleta tirk ber bi ku ve diçe, lewma jî ji bo ku Tirkîye hê xerabtir nebe, alikariyê didinê û ji ber vê yekê dikarin tiştên qaba jî bikin.

Di derketina van problem û tewra qaba ya Ewrûpayê de kêmasiyên kurdan jî tun in? Mesela, eger diplomasi-





ya kurdan di qada navneteweyî de xurt bûya, wê Ewrûpayê li teniştî Tirkîyeyê di warê siyasî û medyayê de karibûya ew çend êrîşî ser kurdan bikira?

□ Bêguman di warê diplomatîk de kurdan di salên dawîn de gavên mezin avêtine, lê belê em hê jî nikarin bibêjin ku di diplomatîyê de em têra xwe xurt in.

Mesela hilbijartina Erbakan a ku Tirkîyeyê ber bi fundamantalîzma îslamî ve dibe, ji bo kurdên ku bi siyasîyê re eleqedar in, keyseke mezin bû ku bi hemû hêza xwe xebateke diplomatîk li hemberî Tirkîyeyê bidana meşandin.

Qeyda MED-TV'yê li Brîtanîyayê ye, ew bi awayekî fermî televîzyoneke îngilîz e. Eger îro ew hatibe girtin, heye ku sibe televîzyonên din jî bêne girtin.

Bi kurtî, li Brîtanîyayê nerihetîyeke mezin hem li cem rojnemevanan, hem jî li cem siyasîetvanan çêbû.

*Ji bo girtina MED-TV Ewrûpa û Tirkîye ketin nav pêwendiyên nû, di warê bazirganiyê de. Nemaze Tirkîye û Fransayê bi awayekî êşkere ji bo girtina MED-TV'yê bi hev re peyman îmze kirin. We ev pêwendiyên wan ji raya giştî re teşîr nekirin?*

□ Min di destpêkê de jî got, dewleta tirk pêşî bi kampanyaya 'televîzyo-

ne her cure fedakariyê bikin ji bo piştgiriya MED-TV.

*Girîngiya rola televîzyonê, (medyaya dîtbar) tê zanîn. MED-TV li gorî derfetên xwe çiqas ev rola girîng pêk anî û tîne?*

□ A rast heta niha ji bo me dema înfarmasyonê (agahdarî) bû. Gelek bernamê dihatin amadekirin, lê hedef tam ne diyar bû ka em ber bi ku ve diçin.

Bêguman rêveberîyeke me jî heye, lê, ji ber ku em nû bûn, hinek tevlihevî hebû. Ji niha û pê ve, êdî em xwedî tecrûbe ne.

*Kurdan çima li MED-TV temaşê*

dengê gelê kurd be.

*Ewê rê li ber MED'ê digirin dixwazin ew bibê televîzyoneke çawa?*

□ Esas em tenê muzîkê jî di MED'ê de derpêş bikin, wê dewleta tirk dîsa li dij rabe. Çunkî bi tu awayî rayedarên dewleta tirk naxwazin televîzyoneke kurd a ne di bin kontrola wan de weşanê bike.

*Niha behsa xebata vekirina televîzyoneke din a kurdî tê kirin, televîzyoneke ku bibê alternatîv li hemberî MED-TV'yê.*

□ Mîmkûn e ew televîzyonekê vekin, lê belê televîzyoneke li hemberî MED'ê wê di bin kontrola dewleta

**D**ewleteke mîna Almanya ku heta meha çaran peyk dabû me, bi mazereta ku em li dij wan kar dikin peyk ji me stand.

Yanê esas ev mesele ne tenê aborî lê her wiha meseleyeke mezin a siyasî ye jî.

Heta, televîzyona me bi xwe jî dikaribû gelek tiştan bike. Mixabin em di vî warî de qels man, eger dostên me zêde bin û lobiya me xurt be, wê nikaribin bi vî şêklî bi ser me ve werin.

Di demên dawîn de xebatên me yê diplomatîk jî dibin xwedî giraniyeke bitesîr. Hejmareke mezin mebûsên ewrûpî jî piştgiriya didin me, wekî din, gelek rojnemevanên wan bi me re ne.

*Niha wekî ku bédengiyek xwe nîşan dide, bédengiyekê di nava xwê de bideng. Gelo ev bédengî tesîreke çawa li welatên Ewrûpayê dike, tîrsekê bi wan re çênake?*

□ Esas zêde jî bédengî tune. Tenê li Parlamentoya Brîtanîyayê 46 parlamenterên îngilîz girtina MED'ê protesto kirin û înzeyên xwe yê protesto yê jî meqamên eleqedar ên dewletên xwe re şandin.

Piraniya rojnemevanên ewrûpî, bi taybetî yê îngilîz, li Almanîyayê wê meseleyê nîqaş dikin, ji ber ku ew bi xwe jî ditirsin.

na terorîstan' rahişt vî karê xwe yê qirêj, ku bi ser neket, vî carê jî kete nav danûstandinên bazirganiyê. Niha bi Fransayê re peymanekê bi 4 milyar dolarî îmze kirîye, ji bo karekî di warê telekomunikasyonê de.

Di vî danûstandinê de Tirkîye îhaleyekê mezin dida şirketeke fransîz bi wî şertî ku Fransa rîya weşanê nede televîzyona MED'ê.

Niha em van kirin û danûstandinan bi belge û kasetan îspat dikin û li hemû derdorên eleqedar belav dikin. Derdorên eleqedar jî, didin zanîn ku ev pêwendî û peymanên navbera Tirkîye û Fransayê yekcar li dijî sincên (ehlaqê) bazirganiyê ne.

*Reaksiyana gel çawa bû li hemberî qutkirina weşanê?*

□ Gel reaksiyoneke mezin nîşan da. Tenê di sê rojên destpêkê de 6700 telefon hatin tevî ku xetê me li hev siwar bûbûn. Ya rastî, rojên pêş gel pir tengezar û bi hêrs bû. Hê jî her roj gelek telefon tên ji me re, bi taybetî jî ji Kurdîstanê. Hemû dibêjin ku amade

**M**îmkûn e ew televîzyonekê vekin, lê belê televîzyoneke li hemberî MED'ê wê di bin kontrola dewleta tirk de be.

Îro gelek kurdên cehş an jî hejmarek mebûsên kurd hene ku di xizmeta dijmin de ne.

*dikir? Ji ber bedewîya wê an jî sirf ji ber ku televîzyona kurdan bû lê di hate temaşekirin?*

□ Ji bo temaşevanên me jî televîzyon dezgeheke nû bû. Mesela, kalekî kurd ê 70 salî pir bi baldarî li televîzyonê temaşê dike, çima? Ji ber ku cara yekem tiştêkî wisa bi kurdî dibîne, her wiha gelek kurdên din jî di rewşa kalê kurd de ne.

Li aliyê din MED-TV bû deriyek ji bo yekîtiya neteweyî, cara pêşî bi saya MED-TV'yê hemû rêxistinên kurd bûn xwedî derfet ku dengê xwe bigihînin gel û xwe baştir bidin naskirin.

Ji çar aliyên Kurdîstanê haya her kesî jî hev û rewşa hev çêbû. Rêxistin û sazîyên kurdan bûn xwedî derfet ku li hemberî gel li ser mijarên cur bi cur bipeyivin.

Di hêla profesyonelîyê de kêmasîyên me hene, hêviya me heye em wan jî di pêşerojê de ji holê rakin.

*Ji aliyê siyasîyê ve MED-TV wê dîsa wekî berê be?*

□ Erê siyaseta me wê eynî be, MED dengê gelê kurd bû û dîsa ewê

tirk de be. Îro gelek kurdên cehş an jî hejmarek mebûsên kurd hene ku di xizmeta dijmin de ne.

Lê belê dîsa jî em demokrasiyê diparêzin. Bila gelê kurd biryara xwe bide ka dixwaze li kijan televîzyonê temaşê bike.

*Ewê televîzyona MED dan girtin, wê careke din rê ji vebûna wê re vekin, madem naxwazin ew vebe, wê careke din astengîyan derneynin?*

□ Niha qanûnê navneteweyî hene li ser çapemeniyê, yanê çiqas jî me hez jî nekin, eger ew careke din rê li ber me bigirin, li gorî qanûnên navneteweyî divê televîzyonên xwe jî bigirin; ji ber eynî sebebên.

*MED-TV'yê berê dengê xwe digihand çend welatan, ji niha û pê ve wê dengê wê çiqas belav bibê?*

□ MED TV li parzemînen Asya, Ewrûpa û li Rojhilata Navîn weşanên xwe digihandin 34 welatan. Ji niha û şûn ve, wê ev siha ji berê ne tengtir be, lê belê dibe ku firehtir be.

# Li gorî çavdêr û lekolînerên biyan Karektera kurdan

**Kurdologê rûsî yê bi nav û deng Minorsky, di civînekê de bersiva pirsra "Gelo li gorî te kurd kî ne?" bi awayekî balkêş wiha tîne ziman: "Kurd ew in ku, ji bilî gelê xwe ji tirk, ereb û farisan re her dem leşkeriyê dikin."**

**B**i sedsalan e ku, xak û dîroka Kurdistanê ji bo çavdêr û lekolînanên biyan bingeha xebatên lêkolînî ye. Her dem dewlemendî û bedewiya Kurdistanê serî li wan gerandiye. Lê belê eleqeya wan ciwanmêran ne tenê ji bo xak û dîrokê, her wiha ji bo şexsiyet û kesanetiya kurdan jî xwe nîşan daye... Ji ber vê yekê jî, heta vê gavê bi dehan behem û pirtûk der barê şexsiyeta kurdan de ji aliyê dîrokan û lekolînerên mîna Soane, Binder, Milingen, Wigram, Lerch, Minorsky û Nikitin ve hatine nivîsîn û weşandin.

## Nirxandin ji hev cuda ne

De werin em dêhn û bala xwe bidin dîtî û ramanên van kesên navdar. Soneyê lekolîner ku li Kurdistanê di nav kurdan de jiyaye û bi zimanê wan mijûl bûye, wiha dibêje:

"Heger em destê xwe deynin ser wijdana xwe û bi adalet tevgerin, ji bo kemperandinekê divê em Kurdistan û Ewropaya 600 sal berê, bînin cem hev. Heke mirov bi vê metodê kurdan û ewrûpiyan ji aliyê îdeal û ehlaqê ve bide ber hev, wê bê dîtî ku kurd êdî pêş ketine.

Hezar kurdên ji rêzê werin hilbijartin û hezar jî Ewropiyên ji rêzê werin bijartin, di muqayeseyê de wê were dîtî ku, ne qencî lê xerabiya ewrûpiyan jî ya kurdan zêdetir e..."

Saone berdewam dike:

"Bi vî awayî jî şexsiyeta kurd kesên çavdêr û lêkolîner dixwe nava tengasiyê, ji ber ku şexsiyeta kurd di nav eşîrên kurdan ên cihê de, cur bi cur e. Ji ber vê yekê jî nirxandineke bi vî awayî ne hêsan e..."

Frazer, di destpêka sedsala 19'an de li Kurdistanê gelek geriyaye û gihîştîye vê encamê:

"Di nav kurdan de ruhê feodal ê rastîn gelekî bi hêz e."

Frazer, di navbera kurdên îro û êlên îskoçî (highlanders) yê berî 300 salî de, gelek nezîkahî û wekhevîyê dibîne...

"Rastî û duristîyeke zexm, girêdahiya soza ku hatiye dayîn, li dijî mirovên xwe şefqeteke payebilind, li dijî jinan li

gorî misilmanên din, tewreke bêhtir insanî, hesta wêjeyê jîndar, evîna helbestan, ji bo eşîrê fedakarî, ji bo qewm û welat serbilindîyeke ji dil û can, li gorî zaravayê bi serbilindî gotina "Ez kurmanc im" an jî "Min kurd im" divê were dîtî."

Zanyar, peyvên xwe wiha didomîne: "Kurd dilsoz in, yekcar diqehirin, zû hêrs dibin, ev yek jî dibe sedema rûdana bûyerên bêhemdî. Li hêla din hisa qerf û pêkenokan di jiyana kurdan de gelekî pêşketî ye. Di her fersendê de behsa pêkenokên ku şexsiyeta wan a bi hêrs tê de derbas dibe, dikin û pê kêfxweş dibin."

Mînakek ji wan pêkenokan:

"Di demekê de li Herêma Oramarê jî Eşîra Herkî mîrek hebûye. Rojek mêşek li ser tiliya mîr xwe datîne û tiliya wî dide ber gezan, mîr tiliya xwe dixurîne, piştî pênc deqîqeyên din dîsa xurîne dest pê kiriye. Hew debara mîr dibe, demançeya xwe derdixe û bi guleyekî tiliya xwe difirîne."

Em vê gavê jî guhê xwe bidin gerokekî Fransî ku di salên 1887'an de li Kurdistanê geriyaye:

"Gelê kurd her çiqas bêrehm û hov be jî, dîsa jî xwedî hesteke qure û serbilind in. Bi sadiqbûnê soza ku dane, tîne naskirin. Eger kurdekî soz dabe ku bi sax û selameti wê bibe cihê wê, bêtirs bila beweriya wê pê were."

Lêkolîner Binder, di berhemeke xwe de behsa efsaneyekê dike. Li gorî vê efsaneyê komek ji artêşa xaçîyan ku riya xwe wînda kiribûn, tevî kurdan bûne. Tê gotin ku ew xaçî îro li Kafkasyayê dijîn, hê jî cil û bergên serdema navîn bi kar tînin, navê wan hevsûrî ne û di navbera zimanên fransî û kurdî de zimanekî bi kar tînin.

## Helwesta lêkolîner û çavdêran

Kumandar F. Miliungen, di pirtûka xwe ya bi navê "Di nav kurdan de jiyana wahşî (1870)" jî ber ku li Ermenistanê di nav milekî artêşa tirk de perwerdehiya şer dike, bi gundên kurd ên derdorê re jî gelek eleqedar dibe. Milingen, "Di şexsiyeta kurd de hêviya xisletên qenc û neqenc heye di tevahiya eşîran de; çi ereb be, çi kurd be û çi



V. F. Minorski

jî kirgîz be gelek nêzikî hev in" dibêje û di berhema xwe de kurdan li dijî wan eşîrên din wahşî dida nasandin. Kuştina zanyarê alman Schultz jî dixwe stûyê kurdan.

Divê bê gotin ku Milingen dost û hevkarê osmaniyan bûye.

Mîsyoner Wigram jî, di pirtûka xwe ya bi navê "Dîroka dîrên suryaniyan de (1910)" der heqê şexsiyeta kurdan de wiha dibêje:

"Taybetiya şexsiyeta kurdan di navbera salên 1000'i (B.Z.) û 1700'i (P.Z.) de tê dîtî ku qet nehatiye guhartin. Kurd zexm in, jîr û çeleng in, di her warî de mîna miqnatîsê mirovan dikişînin cem xwe; gelek karmendên îngîlîz şabûna xwe bi dostaniya bi kurdan re tînin. Lê belê gelo ji akustîka çîyan e, an jî, ji kêmasiyekê afirandinê ye ez nizanim, kurd nivmîrov in, ji aliyê pêşveçûna civakî ve kurdan tu carî xwe ji jiyana eşîrî xelas nekirine..."

Kurdologê rûsî yê bi nav û deng Mi-

norsky, di civînekê de bersiva pirsra "Gelo li gorî te kurd kî ne?" bi awayekî balkêş wiha tîne ziman:

"Kurd ew in ku, ji bilî gelê xwe ji tirk, ereb û farisan re her dem leşkeriyê dikin."

Ji ber ku em dawî li rêzkirina dîtînan cur bi cur bînin, vê gavê jî em bala xwe bidin dîtînan nivîskarê Ermen Aboviyan:

"Eger kurdan jiyaneke dêmanî bido-mandana wê vê gavê bûbûna şovalyeyên Rojhilat; şexsiyeta şerwan, rast û durist, hurmet û girêdahi jî bo mezinan, mêvanperwerî; ev yek hemû ji bo qewmekî bext û xisletên hêja û hevpar in."

Belê ev gotin û dîtînan her çiqas beriya 80-90 salî jî hatibin gotin û îro guhartinên mezin çêdibin jî, didin zanîn ku zanyarên biyan bi çi çavî li me dinêrin.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ



Di navendên çandê de vê heftiyê gelek çalakî hene.

- 19.08.1996 **Duşem:** Li Evrensel Kültür Merkezi, filmê "Rapsodî", gerîhinde: Akira Kruşova, saet: 18.00
- 20.08.1996 **Sêşem:** Li Tohum Kültür Merkezi filmê Mem û Zîn; saet: 18.30
- 22.08.1996 **Pêncşem:** Li Evrensel Kültür Merkezi filmê Akira Kruşova "Dersu Uzala"; saet: 18.00
- Li Tohum Kültür Merkezi; saet 18.30; filmê "Şeva Pênûsan-

Kalemînin Gecesi"

- 23.08.1996 **În:** Li NÇM'a Stenbolê filmê F. Rossellini "Roma bajarekî vekirî- Roma Açaq Şehir"; saet 19.00
- Li Tohum Kültür Merkezi; filmê Yılmaz Güney "Kerî"; saet 15.00
- 24.08.1996 **Şemî:** Li NÇM'a Stenbolê Hunermendê Operayê Ufuk Karakoç: "Anadolu stranek e"; saet 18.30
- Li Evrensel Kültür Merkezi filmê L. Wertmüller; "Heftê Hêjahiyên Şahane-Yedi Harikalar"; saet 15.00
- Li Tohum Kültür Merkezi; saet 14.00'an; li ser faşizmê semînerêk

## RÛDAN

Ji NÇM'ê

# Çar kasetên nû



**N**avenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) çar kasetên nû derdixê. Ev çar kaset ji aliyê şirketa Mazlum-Plakê ve têne tomarkirin û ev kaset li Ewrûpayê hatine amadekirin. Navên hunermendan û kasetên wanê ku wê derkevin:

Dilovan (Şer dikim), Rotînda (Sîser), Werin Dostno / Ji Bo Bîranîna Sêwazê û kaseta Şehrîbana Kurdî.

Kaseta "Werin Dostno" ji stranên yazdeh hunermendan ên li ser bûyera Sêwazê (hem bi kurdî û hem bi tirkî) pêk hatiye. Hunermendên ku di vê kasetê de stran gotine ev in:

Sivas (Grup Kızılırmak), Werin Dostno (Dijwar), Xover Bîdî (Beser Şahin), 34 Na Dêrsim Di (Şahin), Giyana Alî Şêr im (Comerd), Dilo Yeman (Zozan), Pîrê Me-Ye Seyîd Riza (Serhad), Hızır Paşa (Emekçi), Kewte Ra Raye (Eylem), Şere Mino (Şiyar Munzur), Nurhak (Beser)

Kaseta bi navê "Şer dikim" kaseta Dilovan a sêyemîn e. Dilovan di nav

Akademiya Kurdî de karê xwe yê hunermendiyê didomîne. Kaset di bin rêveberiya hunermend Merdan de hatiye amadekirin. Stranên ku di kasetê "Şer dikim" de hene ev in:

Niştîman, Megrî, Dayê, Domamê, Her bijî, Werin, Xortekî Ciwan im, Perişan, Sond, Bavo, Were Berxo, Ha Çelenge Çeleng- Ha Lawo

Hunermend Rotînda Yetkîner jî, berî niha bi du salan di nav Koma Mezra Botan de xebat dikir. Piştî ku di kasetê wê komê çap bûn, kom belav bû û Rotînda jî çû Ewrûpayê. Ew jî vêga di nav Akademiya Kurdî de karê xwe yê hunerî didomîne. Gotin û muzîka stranên di kasetê "Sîser" de, bi giştî Rotînda bi xwe çekirine û rêveberiya kasetê xwe jî, bi xwe kiriye. Kasetê wî ji yazdeh stranên pêk hatiye. Navên stranên ev in:

Gerilla, Bawerî, Bê Te Nabe, Çima, Li Çeman, Sîser, Xovererze, Dildara Mîn, Gulê Hoynar, Tenê, Şervanên Gel.

NAVENDA NÛÇEYAN

### Hûn bi xêr hatin cêwîno

Ji law û bûka A. Melik Fîrat, Mehmûd Feyzî û Emîne Fîrat re du zarokên lawîn çêbûn.

Em ji Mihemed Dilşad û Mihemed Dilhat re temenekî dirêj û jîneke xweş dixwazin.

Xebatkarên Azadiya Welat

## TÎŞK

SÎRWAN REHÎM



### Şikistî gewre bestelekî tirs û bîm

**D**estpêk li rêgay regeyandinî cihanîyewe hewalî serheldanî şerman pêgeyîsit, belam le yek kat da çawekan nuqmî sersamî û xoşewîstiyekî mezin bûbûn. Sersamî ewey ke çon dekrê dir be tem û mijî çekmerekî rom bidrêt. Sersamî ewey ke kên ewaney xo dexene gerûy bê amanî nehengewe û yarî be agir deken. Xoşewîstiyekî gewreş bo ew kurgel û kiçgeley ke bestelekî tirs û bîmî kemalîzim deşkênin, ew bestekey ke zimanî bûn û jiyane le go xistibûyin.

Ew rojey ke mûrîdanî îşk û azadî be agirî çekekanyan 15-y tebaxyan le tewelî mêtû nûsî, her ew rojey gemî mêtû be şemalî ew helmete xoy le nêwan dû bay hawdij da bîniyewe. Êdî lew rojewe eger gemî ême be dilî xoman necûlê, yaxûd her bûnîşî nebêt, ewa gemî neyaraniş wekû caran bê xemane nalengê. Çûn îtir tûşî ziryan û reşeba tûşekanewe.

Lew deme da ke ew mirovane bangî Newrozî niwê û jiyandineweyan de be giwêy kej û ko da, hawkat dûjminanhi kurd û mirovayetiş be niyazî ewe bûn ke le de, dwazde rojêk da kotayî be bûn û jiyani dildorawanî hetaw û azadî bînin û çemî rîq û berengarbûnewe ziwa biken. Ew çemey ke ew dem komele cogeyekî dezûleyî û niha jî dû awanî bê dar û be xûrem le xo da berceste deket.

Belê dirextî xewin û xûlyay ewan zirr û hî êmeş lew rojewe bist, bist bala dekat û xewnî rengawreg le perçem dedat. Emro ew direxte dwazde saleye û şorebiyekî rengîn û kakol zêrîne û derwanete ser çemî sibeynêyekî pir bedew ke le çawanî da mewsimî azadî şepol deden.

Le yadî no saley em werçerxane dîrokîyêş da, le nizîkewe le şarî Stenbol be zelalî hestman pêkird ke ew gullaney le 15-y tebax da teqêndirawin çî karîgerî û bandorêkiyan kirdote ser sercem rojevî ew dewlete zebelah û sersexte. Site me mirovêk ke le zêdî xoy, le amêzî malbatekey da, nikare be kurdî biaxvê û semîgûn bikrê û be dar û berd da bidrêt, le derbederîş da sukayetiş pê bikrê tekneşkê. Komelga le komele ceste û hoşêkî wa pêk hatibû, ke le hemû berekan da be çoka hatibû, be çokdahatinêk ke dest dane bal û xistine ser rêy karêkî fire dijwar bû.

Em rewşê le bakurî Kurdistan şitêkî le ber çaw û belgenewîst bû, ew bakurey ke ser û çawî cestey jiyân û niştîman e, belam êmeş bê aga û dîr bîwîn lîyewe. Ca gemî û be çošî agirî tebax ew laşe sîr û nîw giyaney xistewe kar ke dost û dujminîş çawerwanî nebûn, boye le yek kat da her dû la, dost û dûjmin, pêy sersam bûn û le awerwanî helkirdinî ew bahoze da nebûn.

Emro dwazde sal be ser ew teqê mêtûyîye de tîper debêt ke le tifengî çawne-tîrsî mirovgelêkewe derperî ke werçerxan çêdeken. Dwazde sal le dengdanewey teqeyberengarî û xoparastin, ke bo ême sirûdî şadimanî ye û bo neyaraniş dengî wiryakidînewe, yaxûd zengî merg e.

Selaw lew mirovgeley ke neyanhişt çerxî mêtû bo hemîşe be xwestî neyaraniş mirovayetiş bigerê.. Dirud bo giyanî ew şehîd û pakrewananey ke kirasî awdamaniş tîkoşan û yaxî bûnyan kirde berî bûn û mêtûman..

Serî rêz danewandin bo hemû şehîdanî Kurdistan û mirovayetiş..

# Çend nimûne ji dûrikên li dawetan

**K**urdan, ji ber ku welatekî serbixwe nedîtine, wêjeya kurdî ya nivîskî jî pir kême. Ji ber wê yekê jî wêje (edebiyat) piranî bi devkî maye û wekî çîrok, pêkenok, stranên dengbêjan, dûrik û lorikan bi sedsalan hatine gotin û dewrî hetanî qirnê me bûye.

Ji van mînakên yek ji dûrik in ku li dawetan li ser bûk û zava, xesû û xezûran têne gotin. Li herêma Şemrex (Mazidağ) û Dêrik a Çiyayê Mazî dûrikên ku li dawetan tên gotin hinek mînakên wan li jêr in.

## Dûrikên li ser bûk û zava

Çi newalek dû dirêjo  
Ev berbûna ker û gêjo  
Nikarin yek dûrikekê  
Li ser hevala min bibêjo.

Ha li hewa ha li hewa  
Zava çûye seyda kewa  
Xweyê me bûk anî  
Bûk biçûk e çav li xewa.

Çi arîka heft tenûra  
Li serê pismama gir û hûra.

Nere avê nere avê  
Qorê xaziya nede tavê  
Te mala mêrê xwe dît  
Ji bîr kir mala bavê.

Me bûkek anî ji Helêla  
Mal û milkên xwe tev tê da  
Bûka me sibê rabû  
Nizanibû serê xwe girêda.

Ha li kaşa ha li kaşa  
Qondera bûka me zîv û qaşa  
Jinên sed hezarî tim belaşa.

Çi germika di germê da  
Petêx sor bûne di lemê da  
Bejna bûka me wek şûşa  
li ser lempê da.

Çi darika di hewşê da  
Pel weşande bi ser xabê da  
Bejna bûka me weke takê  
di bexçê da

Wî alî derî wî alî derî  
Me hespa sor ajote ber derî  
Lê lê yadê tu qet megrî  
Me mirazê xwe bir serî.

Zava giş zava ne  
Text ji texta girêdane  
Textê birakê min serekê



Temaman e.

Çi darika devê êşo  
Pel weşande li ser qerêşo  
Navê bûkê nêrgiz  
Yê zavê Ehmedê Dewrêşo.

Rêka Mêrdîn wa bi şujo  
Texsî û makîne bi gujegujo  
Hêdî bajo, bûk tê wer be  
Zava yê me bikujo.

Ha li çîkê wa li çîkê  
Dengê kevok a spî tê  
Dengê Egî û Mezlûm  
Li ser çiyê bi giranî tê.

## Dûrikên li ser xesû û xezûran

Lê lê emojînê qûn çekurê  
Hilîne derî li me veke  
Bira bûk û zava her hundirê.

Hewşa hanê hewşa meyo  
Lê lê xwakê çavên xwe veke  
Emînê xwesa min û teyo  
Wele mere berbê dihere  
Bi goma tê me reyo.

Bavê bûkê di qulçê da  
Pişke pişko  
Kes tune ye jê re poz paqîşko.

Me bûka xwe bi rastê xist  
Xêlika kesk û sor û zer bi ber be  
xist.

Me agir bi dilê dê û bavê xist.

Diya bûkê ciya hiltîne  
Derziya bûkê li şûnê dibîne  
Hêsrê xwînê dibarîne

Çi darika benîştokê  
Min kola heya reh û kokê  
Qonaxa bavê bûkê şev û rojkê

## Dûrikên li ser mal û dewlemendiyê

Çi xanîkî tarî marî  
Ez tê geriyam heya êvarî  
Min tê de dît kevçiyekî zindî  
gemarî.

Sindoqa bûkê pir girano  
Hêlek ceft e yek çortano  
Hêdî bajo siwaro  
Îro barê me pir girano.

# Helwest

Her diçe berhemên nivîskî zêdetir dibin û tê xwestin ku derengmayîna bi hezaran salan, di demeke kurt de ji holê rabe û kurd jî bigihîjin merhaleya bilind; mîna hin gelên din.

Her dem tê behskirin ku çand û zimanê kurdî çiqas dewlemend e û cih û warê kurdan bûye hêlîna şaristaniyê. Ji ber wê jî kurd xwedî xezîneyeke dewlemend in ji vî aliyê ve. Belê ev tev rast in û mirov dikare bibêje ku kurd li ser bingehê baş jî rûdin. Lê rastiyeke din jî; tê zanîn û gotin ku ev dewlemendî, kurdan bi awayekî devkî parastine û anîne heta îro.

Di demên dawîn de mirov li gelek hewlan rast tê, da ku ev zengîniya devkî derbasî nivîskî bibe. Her diçe berhemên nivîskî zêdetir dibin û tê xwestin ku derengmayîna bi hezaran salan, di demeke kurt de ji holê rabe û kurd jî bigihîjin merhaleya bilind; mîna hin gelên din.

Îro her çiqas şert û mercên di demeke kurt de jiholêrakirina vî derengmayîne tunebe jî, bi xebatên birêkûpêk û kolektîf, mirov dikare valahiya di vî warî de kêmîtir bike. Wekî ku me got, mirov rastî hewlên mezin jî tê, lê belê ev hewl ji ber ku ne bi giştî ne, wisa dixuye ku li ber me hê rîyeke dûr û dirêj heye. Heger kesên xwedî pênuş bi zanebûn û bi metodeke baş xebatên xwe pêk neynin, ji xeynî rîyên dûr û dirêj, talûkeyên mezin jî wê derkevin pêşya me.


Mirov dikare bi vî mijarê re eleqedar pirtûka Mirhem Yîgît "Helwest" ku

ji aliyê Weşanxaneya Medya ve di Adara 1996'an de li Swêdê hatiye çapkirin, binirxîne.

Ev pirtûk ji nivîsên cur bi cur pêk hatiye. Bi temamî 36 nivîsên tê de cih digirin û ew, di navbera salên 1975-1995'an de, ji bo hin panel, semîner, konferans û hwd. hatine amadekirin û xwendin. Yanê tê xuyan ku ev nivîs ne ji bo pirtûkekê ne. Îcar mijarên van nivîsan jî li hev nakin, mijarên mîna; ji zimên heta rewşenbîriyê, ji siyasê heta civakiyê, ji nivîsên li ser şexsan heta yên li ser psikolojiyê cur bi cur nivîsên de hene. Ev jî yek ji bîmetodîya vî pirtûkê ye.

Baş tê zanîn ku îro, tarîxa sibê ye û divê mirov hay ji îro û sibêya xwe hebe. Ji bo ku hay jê hebe jî divê mirov çî çalakî û rûdanên diqewimin, ji nêzik ve takîp bike. Lê belê nemimkûn e ku her kes, her tiştî, li her derê bişopîne. Ji ber wê yekê jî mirov dîroka xwe ji berhemên nivîskî dikare hîn bibe. Her çiqas birêz Yîgît bi van endîşeyan -yanê nivîsîna dîroka xwe- hereket kiribe û ev nivîsên xwe berhev kiribin jî, zêdetir şexsî dixuye ev xebat.

Eger di panel, semîner û konferansan de çî kesên ku beşdar bûne, axaftina wan bi temamî bihata nivîsandin û dosyekirin wê bi manetir bibûya û sibe roj jî wê xebatê wê her kesî istifade bikira. Gerçî ev tiştên me behs kir, ne ka-



rê şexsekî du şexsan e, karê saziyan e. Li vî derê rastiyeke din jî derdikeve holê ku pêdiviya me bi saziyên bi vî rengî heye.

Bi rastî jî ez li berhemeke bi vî rengî heta vêga hîç rast nehatibûm; nivîsên şexsekî yên panel, semîner, konferans û hwd. wekî pirtûk werin çapkirin! Ha, heger şairek şîrên xwe, nivîskarek çîrokên çîrokên xwe, yên ku di hin weşanan de hatine çapkirin bike pirtûk, mirov dikare fêhm bike. Em dizanin berî bi hezaran salan însanan çî xebatên ku kirine, tev berhev kirine û şandine sibê. Lê belê rewşa îro û wê demê tu car nabin wekî hev.

Îcar mixabin di demeke kurt de, hin nivîskarên kurd -bi taybetî yên ku bi kurdî dinivîsîn- dest avêtine nivîsên xwe yên ku di nav çend salan de, di hin weşanan de derketine, careke din wan tînin ba hev û mîna pirtûk çap dikin. Wekî tiştêkî ku were kirin nemabe!

AYNUR BOZKURT

## "Aladîn û lampaya bi efsûn"

Ev berhema wergerî, ji hêla 'Weşanxaneya Çandê' ve hatiye çapkirin. Ev çîroka bi nav û deng jî, ji hêla Bavê Berzan ve li kurmançî hatiye wergerandin. Berhem bi navê rêza "ji çîrokên hezar û yek şev- Tusenochnatt" derketiye.

Pirtûk bi xêzan hatiye xemilandin û 54 rûpel e. Kaxîzê spî yê spehî hatiye bikaranîn. Di dawîya pirtûkê de hem alfabe ya kurdî hatiye nasandin û hem jî cih dane ferhengoka kurdî- kurdî. Ferhengok jî bi awayê ku kîjan peyv di kîjan rûpelê de ye û li hemberî wê peyvê jî peyveke ku di wateya wê de ye hatiye danîn. Her wiha di rûpelê dawiyê de daxuyandine ku hin berhemên wan li ber derketinê ne.



Lê navnîşana weşanxaneyê nehatiye diyarkirin. Tenê agahiyek di pirtûkê de heye ku pirtûk li Swêdê çap bûye.

Di zimanê wergêr de hinek xeletiyên bikaranîna cînavkan û çewtiyên tewangê balê dikişînin. "Di nav vî bajarê de" "Ew qet nedixwest li malê raweste" jî tenê du mînakên ket û ber in. Li gorî rastnivîsa kurdî rastiya mînaka yekemîn, "Di nav vî bajarî de", rastiya mînaka din jî, "Wî qet nedixwest li malê raweste." ye.

## Hema bi Xwedê eynî televîzyon e!

MAZHAR GÜNBAT



Dema roja pêşî MED'ê dest bi weşana xwe kir, li rojnameya Yenî Politikayê me lê temaşê kir, ji kêf û heyecanê devê me vekirî mabû, lê tu deng ji kesî nedemediket. Bêdengiya me bi van gotinên hevalekî ku ji Kurdistanê hatibû wir û ew şev li wir mêvan bû, xera bû: "Hema bi Xwedê eynî televîzyon!" Lê belê wî hê jî bawer nedikir ku ew televîzyona kurdî ye û wekî televîzyonên din weşanê dike, bi çavê xwe didît, lê bawer nedikir. Dîsa di eynî rojan de li Stenbolê û li gelek bajarên din ên Tirkiyeyê bi hezaran kurd ketin dût peydakirina antênan, lê belê problemek hebû; piraniya kurdên ku diçûn cem antênfiroşan bi wan re diketin nav diyalogê wîha:

"Antênên we hene?", "Belê.", "Antênên we kîjan televîzyonan dikişînin?", "Hemû televîzyonên ku li Ewropayê weşanê dikin.", "Antênên we bi rastî jî hemûyan dikişînin?", "Belê.",

"Hemûyan?", "Erê bira hemûyan.", "Yanê hemû hemûyan?!", "Erê erê antênên me Med TV jî dikişînin, vêga dilê te rihet bû?"

Ji aliyekî ve antênfiroş pir kêfxweş bûn, lê ji aliyê din ve, ji ber vî bazara bişuphe serê wan diêşîya. Di wan rojan de zarokên kurd ên ku li filmên kartûn temaşê dikirin, çavên xwe ji televîzyonê nediniqandin û qîr didan: "Yadê, yabo! Pisîk û kûçikên di televîzyona me de bi kurmançî xebir didin, çivîk û mar jî wa bi zimanê me dişexilînin!" Helbet heta niha van zarokan wisa dizanibû ku sewalên di xêzefilman de, tenê bi tirkî dizanin, belkî li mektebê fêrî îngilîzî jî bûbin, lê belê wê kê kurdî fêrî wan bikira?

Di demeke kin de, hemû kurdan bawer kir ku kurd jî dikarin bibin xwedî televîzyon û di televîzyona xwe de cih bidin zimanê netewe û hinidika hiyên din jî. Êdî kes jî bo kirîna antênêkê nediket nav diyalogên wisa dût û dirêj; tevî hemû êrîş û pestên dewleta tirk hê mehek di ser weşana MED'ê re derbas nebûbû, li gundekî Agiriyê gundiyan ku pereyê wan têra antênan nebûn, di nav xwe de pere kom kirin û antênêke mezin standin, li meydana gund danîn û hemû gundiyan (zêdeyî sed mal) kabloyên xwe pê ve girêdan. Zarokên Kurdistanê jî bawer kirin ku sewalên kurdîzan jî hene û fêr bûn ku dewleta tirk heta hingê kurdî li sewalên televîzyonê jî qedexê kiriyê. Êdî ji bo

wan saeta bernamêya Rîndo muhîm bû.

Lê belê dîsa jî hin kes hebûn ku hîç nedixwestin fêrî hebûna MED'ê bibin: Rêveberên dewleta tirk û hevalbendên wê. Vebûna MED'ê jî her kesî zêdetir tesîr li berpîrsên dewleta tirk kir. Wan bawer dikir û dizanibû ku ew televîzyona kurdan e, lê belê çavê wan bernedida lê binêrin, bi şev jî hem ji tîrsa, hem jî ji xezêba dilê xwe, xew bi çavê wan nediket. Ma wê çawa xew bi çavê wan biketa? Ew ziman, ew çand, ew dîrok, ew stran, ew hest û ramanên mirovî yên ku bi sedsalan rê li ber wan girtibûn û li gorî xwe ew vemirandibûn, dût re xistibûn binê betonê, ji nişka ve careke din li ser ekranên televîzyonêkê, li ber çavên mirovên 34 welatan vejîna xwe diyar dikirin. Wekî din, wan baş dizanibû ku ew televîzyon, wê yek bi yek hemû wahşetên wan ên li dijî mirovahiyê derîne holê. Ew dizanin, xwedê dizane û xwediyên televîzyona Medê dizanin wan, ba'v û kalên wan û hevkarên wan li Kurdistanê çî kirine, çî nekirine! Wê çawa xew bi çavê wan biketa heta Med TV nehata girtin.

Ji bo demeke kin be jî dewleta tirk di girtina televîzyona kurdan de bi ser ket, piştî wê serkeftinê xew bi çavên berpîrsiyarên dewleta tirk ket an na em nizanin, lê belê ketibe jî, xuya ye dîsa şevên xewrevîn yên zivistanî dane devê deriyê wan; MED va dîsa bixêr hat.

# Dostaniya gundî û serleşker

**W**extekî mirovekî gundî û serleşkerê qereqolê təkiliyên xwe yên "dostane" bi hev re datînin. Li nav dehla Feqe Xalid dareke karçînê (hirmî) hebû. Karçînen xweş û şîrîn çêdibûn. Karçîna Feqe Xalid li pêşiya karçînen hemû gundiyan çêdibû.

Dema karçînen Feqe Xalid ên şîrîn çêdibûn, hê ku zarokên wî nexwaribûn, Feqe Xalid selika xwe tijî dikir û dibir ji "dostê" xwe yê serleşker re.

Dîsa, rojekê Feqe Xalid selika xwe tijî karçîn dike û berê xwe dide qereqolê. Dema ku diçe qereqolê, leşkerên qereqolê Feqe Xalid jî digirin û tevî hinek gundiyan welatparêz dixine nezaretxaneyê. Feqe Xalidê me, heftiyekê di nezaretxaneyê de dimîne; gelek lêdanê dixwe.

Rojekê leşkerên qereqolê Feqe Xalid û wan gundiyan welatparêz ji nezaretxaneyê derdixin û dibin ba serleşker. Dema ku serleşker dibîne "dostê" wî Feqe Xalid jî di nav wan gundiyan girtî de ye, serleşker ji dostê xwe dipirse: "Ma tu di nav wan gundiyan terorîst de çî dikî û çî karê te heye?" Feqe Xalid dikene û



dibêje: "Min ji te re selikek karçîn anîbû. Lê leşkerên te ez girtim û kirin nezaretxaneyê."

Wê demê serleşker bi derewî mirûzê xwe tîrş dike û ji dostê xwe Feqe Xalid re dibêje: "Ji ber ku leşkerên min tu du heftayan di nezaretxaneyê de hiştine û tehdeyî li te kirine, pêwîst e ez tola vê hildim. Ger hinek daxwazî û pêşniyazên te hebin pêwîst e tu ji min re bibêjî, da ku ez pêk binim û mafê te ji stûye xwe

derxim."

Feqe Xalid serê xwe dihejîne û dibêje: "Bi rastî jî sê xwestekên min ji te hene. Ger tu wan xwestekên min binî cih, ezê gelek memnûn bibim."

Serleşker dibêje: "Ka bibêje xwestekên te çî ne?"

Feqe Xalid dibêje: "Xwestekên min Quranek, werîsek û bivirek e."

Wê demê serleşker şaş dimîne û dibêje: "Ma gelo, tuyê çî ji wan xwestekan bikî?"

Feqe Xalid bersiva serleşkerê dide: "Ezê pê bivir karçîna ku ez heftiyekê ji bo wê mam di nezaretxaneyê de, ji binî ve bibirim. Dema min birî, ezê qet qet bikim û bi werîs bikişînim malê, da zivistanê ez û zarokên xwe, xwe li ber agirê wê germ bikin."

Serleşkerê qereqolê dibêje:

"Ev her du xwestek min fêm kirin. Lê belê min ji xwesteka te ya sisiyan fêm nekîr."

Feqe Xalid: "Dostê min î hêja, ezê bi Quranê sond bixwim ku êdî tu car ez bi leşkerên tîrkan re têkilî danayim û nabim dost. Ger hinek haysiyet di min de hebe pêwîst e ez vê bikim."

MEHMET SÎDA

## XELAT...

## XAÇEPIRSA BIXELAT (29)

## XAÇEPIRS

R	C	K	N	A	A			
A	S	O	E	S	K	E	R	Î
A	P	O	L	T	A	R	A	L
E	T	A	E	S	E	M	R	
R	N	E	W	T	O	N	R	
I	N	G	E	R	I	S	A	
A	N	E	M	I	S	A		
O	P	A	L	R	Û	M		
E	L	B	E	R	I			

PEYVA VEŞARÎ → W E L A T E M E

### Bersiva Xaçepirsê (27)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 29'an kaseta **Koma Serhat "Ne şerm e"** ye.

#### Jêrenot:


Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.




Kesên ku xelata xaçepirsa 27'an, kitêba Suzan Samancı "Bajarê Mirinê" qezenc kirine: **Berfin Taş/Amed, Ruhol Akyıldız/Batman, Eğitim-Sen/Amed, Sabih Gümüşsoy/İzmir, Selma Timur/Bartin, Aydın Karahan/Bolu, Jiyan Altunşimşek/Batman, Zinar Çavreç/İzmir, Ramazan Başarı/Antep, Fırat Batur/Diyarbakır**

Şairekî kurd (wêne)	Strî, dirî	Kurdentvî sina (Litre)	Bi inglîzî çay pîvaneke girantîyê	Gîthanekek	Beşek ji zîmanê indo-ewrûpî
Îbadet	Çem	Celebeke pîvanê			
2				6	Sebzeyeke tûj
Ne zelal			Yezdanekî Misrî	Îrdiyûm	
Li Efrîqayê dewletek			Qerf, henek	Organ	
			7	Gopal	
			Dinya wî alî		
Keçîk (bîyanî)		1	Rêlek li Brezilyayê Xwedîyê aş		
Madenek			Genimê hêrandî Ajanseke li Tirkiyê	Xwişka dê	8
				Heyf	
Şivan û gavan li xwe dîkin	Sulh			4	
	.....a Zebeşan				
			5	Mewqî, cih	
Notayek					
Spor		Malbat			
3				Filmeke Spielberg	

PEYVA VEŞARÎ →





## Mirovê welatparêz divê ji zimanê xwe hez bike

Divê rêxistinên kurd, kovar û weşanên xwe li gori berê pirtir bi kurdî biweşînin. Ên ku nivîsên wan gelek têne xwendin, divê êdî bi kurdî binivîsin.

Min bi Welatê Me dest bi kurdî kir. Niha ez bi hêsanî hemû weşanên kurdî fêm dikim. Lê, axaftina min hê ne baş e. Ez ji bo hînbûna zimanê kurdî li ber xwe didim. Bi piranî jî ez bi ser dikevim. Ez bi kal û pîran re dipeyivim. Ji bo çîrok û metelokên kevn ez bi wan re dipeyivim.

Divê hûn hejmarên nivîskarên xwe zêde bikin. Çima mirovên me bi kurdî nepeyivin? Divê hûn li ser vê kûr û dirêj bisekinin û di rojnameyê de binivîsin. Hinek dibêjin: "Mirovên me girîngiya zimanê xwe fêm kirine." Lê bi min, ew qas bi hûr û kûr fêm nekirine. Mirovên me yê li derveyê welat in, dîsa jî bi tirkî dipeyivin.

Divê hûn naveroka rojnameyê dewlementir bikin. Li ser psîkolojiyê, psîkanalizê, politîkayê jî bisekinin. Pîrsa zimanê me gelekî girîng e. Mirovên me yên ji zimanê xwe fedî dikin bi piranî dibêjin: "Zimanê kurdî zimanekî feqîr û bêmantîq e." Divê bê zanîn ku, ger mirov ji zimanê xwe hez bike, welatparêzbûn gelek hêsan dibe.

Li dora min gelek mirovên di nav sîstemê de hebûn. Min qala zimanê kurdî kir. Min qala rêzimanê kurdî kir. Mirovek ji leşkeriyê hati-bû. Sibê çû rojnameya Demokrasi stand, berê tim digot: "Ew hemû terorîst in."

Zimanê ku hatiye talankirin, kesîtiya ku hatiye talankirin e.

Têkoşîna me gelekî mafdar e. Ku me rastiya xwe hûr û kûr eşkere kir

her kes wê me fêm bike. Ez bi hemû dilê xwe bawer dikim.

Bi ya min, divê hûn di bergên rojnameyê de resimên (wêne) resamên kurd bi kar binin.

Mirov û nivîskarên navdar jî bila nivîsên xwe bidin wergerandin û tevî we bibin.

Çima Rojnameya Demokrasiyê cih nade kurdî. Divê hin rûpelên xwe bi kurdî amade bike.

Divê rêxistinên kurd, kovar û weşanên xwe li gori berê pirtir bi kurdî biweşînin. Ên ku nivîsên wan gelek têne xwendin, divê êdî bi kurdî binivîsin.

Em bi piranî dibêjin ku em azad bibin, emê hingê bi zimanê xwe binivîsin û bixwînin. Ev jî, bi min, şaşiyeke gelek mezin e, xwe xapandin e.

Ez xortekî şoreşger û sosyalîst im.

Lê, ez eniyeke dorfireh diparêzim û li Abdulmelîk Firat, Altan Tan silav dikim.

Yek jî, ez ji malbateke alewî tîm.

Bi min, kurdistanîyên ku, tehemûla dîn û mezhebên din nakin hê nebûne kurdistanî. Hê girîngiya doza neteweyî fêm nekirine. Hemû çand û raman, kulîlk in. Divê bêne parastin.

Roman û çîrokên kurdî gelek hindik in. Em li her derê li weşanên kurdî digerin. Weşanên ku li Swêdê derdikevin, çima li Tirkiyeyê jî dernekevin?

RÊNAS DILOVAN

Destpêk rûpel 16

### Kurdên Kafkasê

Piştî çend rojan, li quntara Çiyayê Elegezê, jineke kurd bi navê Tezegul, ku piştigirîya wî muhendîsî bû der heqa Bedir de wiha gote min: "Her kurdê ku li van deran dijî, dema bi berbangê re çavên xwe vedike, Çiyayê Agiriyê ku li hêla din ya sînor e, dibîne. Li heybeta wî dinêre. Em tev siya wî li ser xwe dibînin. Ev, sebek e ji bo me..."

Li Êrîvanê gundekî biçûk, ez li ber ronahiya findeke, guhdariya Şefê KGB'ê yê berê û Serokwezîrê Kurdistanê Sor Wekîl Mistefa dikim. Berî ku dest bi çîroka daxuyandina fermî ya Komara kurdî bike, me li hal û kêfxweşiya hev pîrsî. Bêrawest hêla din a sînor dipîrsî û dabaş dianî ser Eşîra Birûkî... Dema kesên ku wî dipîrsîn, nasê min derketana pir pir kêfa wî dihat. Mîna Êrîvanê, wî jî hêz û delaliya xwe ya berê wîndî kiribû. Ev kula bêderman bû û ketibû ser dilê wî. Lê ew xewna wî, wekî her mirovê têrhevî û xwedî hêza berxwedana jiyane, bi daxwazeke mezin û geş dagirtî bû. Digot:

"Kurdîstana Sor wê bibe xasbexçeya Kurdîstana mezin." Lê, vê gotina min dilê wî şikand; "Ermenîyan, bi finasî kurd bi kar anîn?" Lê, neda der.

Piştî jihevketina Sovyetîstanê wekî her karbendê KGB'ê wî jî piraniya hebûna malûmewdanê xwe di têkoşîn û berxwedana Kurdîstana Sor de daye. Ev pêkaniya tu car nedianî ziman, nedikir dabaşa galgala xwe. Hê jî, ji bo xeyal û hêviyên xwe berdewam dike. Bi wan gotinên ku berî niha min ji devê kal û pîremîrînen gundî bihistibûn û di bîra min de mabûn, diaxivî: "Bi saya Xwedê eşîr û el tevan wê bibin yek. Pişt re emê birayên xwe yên ku li çolîstana Navenda Asyayê belav bûne, binin Kurdîstana Kafkasê û pişt re emê wan bigihînin Serhedê..."

Wekîl Mistefa, dema dawîya wotka ku danîbû navbera min û xwe xelas kir, çîroka trajediya malbata xwe ya ku bi destê Stalîn, ji Azerbeycanê sergomî Kazakistanê kirin û çîroka pismamên xwe yên li Wanê xelas kiribû, vegot. Dabaşa me ya li ser Kurdîstana Sor jî mabû roja din. Ji sedema pevçûn û şerê navbera ermenî û azerîyan, welat vala bûbû. Serokwezîrê Komara Kurdî, ku mabû bêmirov, dema kete nava livînan, bi dilekî şikestî got: "Heger rojekê ez biçim Wanê, ez dikarim bêpirsiyarî û rêber gundê bavê xwe bibînim û nas bikim".

Ji pirtûka 'Were dengê min' ku wê di demeke nêzik de bê weşandin, hatiye wergirtin.

Wergera ji tirkî: MEDENÎ FERHO

WELAT

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Gazete)

Li ser navê Zerya Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına Xwedî (Sahibi) CELALETTİN YÖYLER

Gerînendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni) MEHMET GEMŞİZ

Heyeta Weşanê (Yayın Kurulu) AYNUR BOZKURT SAMİ TAN RAHMİ BATUR

Berpirsê Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) DÜZGÜN DENİZ

Berpirsê Saziye (Müessese Müdürü) TAHİR ELDEMİR

NAVNİŞAN Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu / İSTANBUL TEL-FAX (0 212) 251 90 13 ÇAPXANE Yeni Asya Matbaacılık A.Ş. BELAVKIRIN BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME (Temsilciliklerimiz) Nîmîndendeyê Giştî yê Ewrûpayê:

Mazhar Günbat Suriye: Jan Dost Helim Yûsiv 963-21-960099

Berlin: Silêman Sîdo 49-30-69002695

Hannover: Selîm Biçûk 49-5721-81360

Munchen: Mahmut Gergerli 49-871-670884

Bruksel: Medenî Ferho 32-02-466037

Stockholm: Robîn Rewşen 46-8-7510564

Bonn: Ahmet Baraçkılıç 49 228 66 62 49

Hollanda: Remzi İlhan 312 06 32 31 28

Celle: Wezir Saçık 49 50 52 87 36

# Hêla din a Arasê: Kurdên Kafkasê

Dema ku dewleta Tirkiyeyê hate damezirandin, êdî Ava Arasê bû xet û kete navbera me, ew Deştê Şîxalî bûbû du şeq.

Piştî 76'an dema ku Sovyetistan tertûbela bû, rê vebûn, em jî ber bi pis û pismamên xwe re bezîn. Me ew dîtî û me hev nas kir. Em hatin ba hev û bûn mêvanê hev.

Bi hesreta sed salan me civata xwe gerand. Bîranîn û serpêhatiyên xwe anîn ziman. Em tê gihîştin ku di eynî dem û rojan de, bi xewnên wekî hev em razane û me xewnên wekî hev dîtine. Û di nava yek xeyala dûr û kûr de em mijûl bûne.

MEHMET AKTAŞ

**d**zarokatiya me de Êrîvan, bajarê ronîşankê bû. Ji bo zarokên Agirî dûr û warê negihandinê bû. Ji Arasê wê de, me guman dikir ku stêrkên cihanê tev li vî bajarî gihane hev. Li Arasê, gelo çima her dem dûrketin hebû? Me nizanibû û em tê negihîştin. Piştî rojên koçberiyê, bi jêr de ku em ber bi şaristariyê bi ronîşank de diçûn, bêrawest ew çûkên Elegezê hambêz dikirin. Hinekan ji me digot, ez bi wan re diaxivim. Me jî car caran bawer dikir.

Me di wan şevên zivistanê yên dirêj de, ji rûspiyên kal û bapîrên xwe çîrok û çîrvanok û serpêhatiyên xela û celayê, şer û cengê, rev û bazdanê guhdarî dikir. Kal û bapîrên me her digotin li wê hêla din a Arasê pis û pismamên me hene. Bi gotinên xwe re digirin. Me, di çîrok, çîrvanok, serpêhatî, evîn û nevinên xaltik, metik, ap û xalên xwe yên hêla din de, dengên nalîn û axîna mirinê dikir. Ew kilam û stranên ku di deng û awaza dengbêjên dora Agirî de ku bi welîna bilûra şivanan re govend digirt, ji Elegezê dest pê dikir, li Agirî di nava kavil û sikêrên dîrokî de nelex dibû. Ev



Li pişt çiyayê Agiriyê, pis û pismam, nas û cîranên me ... çawa dijîn?

çiya, her û her bûne bav û bira, em jî wan wilo dinasin.

Piştî gelek salan, dema wan rojên ku radyo dest bi weşanê kir, cara yekemîn ku Casimê Celîl got "Gelî guhdarên ezîz, Radyoya Yêrewanê xeber dide", me dengê wan bihîst. Xelîl û Evdal, Şeroyê Biro, Garabêtê Xaço, Seyadê Şemo, Zadîna Şakir, Eslîka Qadir û hwd. dengê bi dehan dengbêjên Kafkasê, çîrok û çîrvanok û serpêhatiyên pis û pismamên xwe bihîstin. Bêrawest bi salan dengbêjên Elegezê, Telînê, Tiflîsê, Aboyan bi deng û awazên xwe yên tîr axîn û evîn, bi hesreta tîr kulîn, loran-din. Çiyayên me, deşt û newalên me, kul û merezên me, ew qedera ku bi destên bextreşan hatibû nivîsandin, welandin.

Lê, mixabin me, yek carê jî dengê xwe negihande wan. Bes bi salan ku me dengê 'Yêrewan xeber dide' dikir, li welatê xwe yê tîrqedexe, em dibezîne ber radyoyan.

## Em tev bi yek xewnê razane

Dema ku dewleta Tirkiyeyê hate da-

mezirandin, êdî Ava Arasê bû xet û kete navbera me, ew Deştê Şîxalî bûbû du şeq. Piştî 76'an dema ku Sovyetistan tertûbela bû, rê vebûn, em jî ber bi pis û pismamên xwe re bezîn. Me ew dîtî û me hev nas kir. Em hatin ba hev û bûn mêvanê hev. Bi hesreta sed salan me civata xwe gerand. Bîranîn û serpêhatiyên xwe anîn ziman. Em tê gihîştin ku di eynî dem û rojan de, bi xewnên wekî hev em razane û me xewnên wekî hev dîtine. Û di nava yek xeyala dûr û kûr de em mijûl bûne. Niha, piştî jihevduketina sed salî, em hev û din hambêz dikin. Piştî pir salan, wekî dem û dewranên berê, bi cîrantî, doz û yarî, pis û pismamti... em careke din bi hev û din re ne...

Cefoyê Evdal, ji Êrîvanê çû welatê xwe û li Botanê şehîd ketiye. Kurdên Cizîra Botan ji bo kurdên Elegezê xwe-pêşandaneke rêzgirtinê li dar xistin. Berî ku ez Keremê Angosî nas bikim, min li Stenbolê, ji komeke muzîkê ya kurd strana 'Sîpan' guhdarî kiribû. Ev stran kurtedîroka kurdên Kafkasê û hesreta wan a welat û hezar salî bû.

'Ka here erda Wanê/ Bibîne Çiyayê sîpanê. Ev her du rêzik bi rojan li nava kolan û çaryanên Stenbolê, di devê min

de, bûn gotin û liviyan. Yê ku helbesta Sîpan nivîsiye Endamê Komîteya Navendê ya Partiya Komünist a Gurcistanê yê berê û Berpirsê Radyoya Tiflîsê Beşa Kurdî Keremê Angosî bû. Ew ji kurdên Ezdahî ye ku ji dora Çiyayê Sîpanê sergomî van deran bûne û navê wî çiyayî pîroz ku dayê pir cih û gundan

Ew dibêje: "Me navê cih û warê bav û kalên xwe yên ku li hêla din a sinor mane, da vî cih û warê ku em lê cîwan bûne" û dibêje "Min siruş û sawîra xwe ji wir standiye û helbesta 'sîpan nivîsandiye."

Kêlîka ku ez, ji Tiflîsê li trenê siwan bûm û ber bi bajarê ronîşankî yê zarokatiya xwe ve çûm, min Bedir nas kir. Gote min: "Ez qet neçûme hêla din a sinor, lê ez dikarim, ji hember ve, navê wan gund û çiyayan û mesil û newalan tevan bibêjim." Yek bi yek dibêje jî..

Bedir: "Bavê min heya roja mirinê jî, bêrawest dihate serê mitikekî li hemberî Çiyayê Agirî û bi saetan li bilûrê dida. Car caran ez jî bi xwe re dibirim, navê cih û waran ji dûr ve digote min, behsa pis û pismamên me, dost û kirvên me yên wê derê dikir."